Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1141 | 7-Sibat- 2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Ziwatî û bandora li ser hawirdor û civakê



Ziwatiya ku li Daristanên Baranê yên Amazonê zêde bû, têkildarî paşeroja ekosîstemê pirsgirêkên girîng xist rojevê. Ziwatiya li Amazonan hem ji aliyê hawirdorî hem jî ji aliyê civakî û aborî ve pirsgirêkên cidî diafirîne. Ji ber ziwatiya li Amazonên Brezîlyayê xureka bingehîn a li ser zêdeyî 500 hezar kesî dibe ku kêm bibe. Kêmbûna ava çem ji bo mirovên bi masîgiriyê debara xwe dikin dibe sedema pirsgirêkên cidî û li herêmê rewşa lezgîn a hawirdorî hatiye ragihandin.

Ziwatî ji ber guherîna avhewayê ya global bi rengekî cidî dewam dike. Ziwatî bûyereke xwezayî ye ku gelekî hêdî destpê dike, li qadeke berfireh belav dibe û li ser mijarên aborî, hawirdorî û civakî dikare bandorê bike. Ziwatiya Ewropayê ya sala 2005'an û Ziwatiya li Tejaneya Derya Spî ya 2007-2008'an, nîşan didin bandora ziwatiyê li ser herêmên cuda çiqasî cidî û giran e.

Bi taybetî zêdebûna pileya germahiyê û kêmbûna ava li çem, bandoreke cidî li ser jiyana li nava avê ya li herêma Amazonê dike. Di nava hefteya dawî de li Amazonan zêdeyî 100 yûnûs mirin ku ev yek jî cidiyeta vê pirsgirêkê radixe pêş çavan. Pêwendiya vê yekê yekser bi ziwatî û zêdebûna germahiyê tê danîn. Ev yek her wiha bandorê li jiyana xelkê herêmê jî dike. Pirsgirêkên peydakirina xureka bingehîn û avê, dibe sedema krîzên civakî û aborî. Bikaranîna zêde ya çavkaniyên avê, qirêjî û rêbazên şaş dibe sedem ku herêm û aboriya wan hîn bêhtir lawaz bibe.

Ji ber vê yekê ziwatiya li Amazonê ne tenê pirsgirêkeke hawirdorî ye, di heman demê de xwedî wê potansiyelê ye ku veguhere krîzeke aborî û civakî ya berfireh. Ev yek girîngiya stratejiyên rêveberiya hawirdorê yên daîmî û têkoşîna li dijî guhertina avhewayê ya global careke din destnîşan dike.

Rewşa li Amazonê pirsgirêkên hawirdorî yên li deverên cuda yên cîhanê jî nîşan dide. Mînak Resîfa Mercan a Mezin a li Awûstralyayê bi bilindbûna pileya germahiya li okyanûsê û asîtbûna okyanûsê re bi gefeke cidî re rû bi rû ye.

Ev rewş nîşan dide ku parastina ekosîstema li deryayê û têkoşîna li hemberî guhertina avhewayê çalakiyeke lezgîn e. Li aliyê din helandina qeşa Arktîkê, bilindbûna asta deryayê û guhertina pêlên hewaya global a ji ber vê yekê, bandorê li hevsengiyên ekolojîk ên li tevahiya cîhanê dike.

Li Efrîkayê jî ziwatiya li herêma Sahelê û çolbûyîn zexteke mezin li ser civakên xwecihî û çandiniyê dike. Ev mînak jî nîşan didin ku krîza avhewayê ya global ne tenê li hin herêman e, bandorê li tevahiya cîhanê dike.

# IQ'ya zarokê 12 salî ji Eînsteîn û Hawkîng bilindtir derket

Li herêma Devon a Îngîlistanê zarokekî 12 salî di testa Cattell III-B IQ'yê de hem Albert Eînsteîn hem jî Stephen Hawkîng li pey xwe hişt.

Zarokê bi navê Rory Bîdwell du pûanan ji du mirovên zanyar zêdetir stend û pûana herî bilind ku 162 e bi dest xist. Li gor nûçeya North Devon Gazette, Rory Bîdwell du hefte piştî rojbûna xwe ya 12'emîn li Exeter "bêyî amadekarî" kete testeke du saetan.


Di encama testan de Rory rekor şikand û 162 pûan a bêhempa bi dest xist. Heke em berawird bikin; em dikarin bibêjin ku du fîzîknas, Albert Eînsteîn û Stephen Hawkîng, xwedî IQ'yên 160 bûn.

Çend roj piştî van encaman, Rory vexwendin Mensayê ku yek ji wan komeleyên li cîhanê xwedî IQ'yên herî bilind tê de cih digirine.

Rory yekem car dema ku ew du salî bû, nîşaneyên jêhatîbûna zîhnî ya derasayî nîşan dida û bi tena serê xwe puzzlên ji 100 perçeyan pêk tê çêdikir.

Piştre di sala duyemîn a dibistana navîn de serwerî bernameya cebrê ya pola 7'an bû. Li gorî dayika wî, ew "mejiyek bêhempa ye ku dikare her tiştî fam bike û agahiyan ji ber bike."

Tevî vê yekê, Rory hîn jî zarokekî 12 salî ye û normal e ku carinan hewce dike spartekên wî yên dibistanê ji wî re bê gotin. Kurik di heman demê de di warê werzîşê de jî baş e û di kros û ragbî de nûnertiya dibistana xwe dike. Li gorî The Guardîanê ew ji hêla tîma futbolê ya Torrîdgesîde ve jî wekî lîstikvanê salê hate hilbijartin.



# Salih ê Hamayî jiyaneke ku lê nefesê bistîne li Rojava dît

**Salih ê Hamayî ku sala 2015'an koçî navçeya Rimêlan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir, wiha got: "Me li Rojava jiyaneke ku em bikarin lê nefes bistînin, dît. Ji bo ewlehiya zarokên xwe, min cihekî ji Rojava baştir nedît."**



Gelek Sûriyeyî bi hêviya jiyaneke baştir koçî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kirin. Salih Hisên Xidir ê Hamayî jî yek ji van e. Salih ji gundê Şerîa yê Hamayê ye û bavê 8 zarokan e. Salih 57 salî ye û ev 26 sal in bi seravantiyê ve mijûl dibe. Di Kooperatîfa Çandiniyê de bi hevjîn û keça xwe re dixebite.

Salih sala 1998'an li Tartûsê bi cih bû û heta her du salên destpêkê yên krîza Sûriyeyê li Tartûsê bi serantiyê ve mijûl dibe. Bi krîzê re şert û mercên jiyanê her ku diçe zehmet dibe. Li ser vê yekê sala 2014'an vedigere gundê xwe Şerîayê. Ji ber bombebarana dijwar a li ser gund, tenê 9 rojan li wir dimîne. Ji bêçaretiyê li kampa li Îdlibê bi cih dibe. Salih diyar kir ku jiyana kampa li Îdlibê ji ya Tartûsê cuda nîne û got: "Me berê xwe daba kuderê, derî li me dihat girtin. Ji ber şert û mercên xerab me nedikarî bijîn. Kurekî min li Rojava bû û sala 2015'an em hatin navçeya Rimêlan a Rojava. Sala 2016'an min li karê xwe yê li Serayan dewam kir. Ji ber ku em alîgirên jiyaneke bi ewle û aram in, em hatin vir. Şert û mercên xebatê jî zêde ne. Derfetê xebatê yê piralî tê dîtin."

### Seravantî belav dibe

Salih diyar kir ku beriya seraya sebzeyan a li Rimêlanê hatî destpêkirin, berhemên îthalê hatin Dêrik, Girê Legê û Rimêlanê û wiha domand: "Di seravantiya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê belav bûyî de, îthalat pir kêm bû. Ji bo ku mirov di aboriyê de hîn zêdetir bi kêr xwe were, divê seravantî hîn zêdetir bê kirin. Hormon di nava berhemên me de nînin. Em ji bo mezinkirina berhemên xwe, rêbazên xwezayî bi kar tînin û bi vî rengî avakirina civaka bi tundurist weke hêman dibînin. Bi seravantiyê em li gorî berhemên di piyasê de, sebzeyên hîn erzantir digihînin gel. Bi vî rengî gelê me jî di aliyê aborî de zêde zehmetî nakşîne."

### Jiyana ku mirov bikare lê nefes bistîne

Salih destnîşan kir ku ew bi malbata xwe re li Rojava kêfxweş e û ev tişt got: "Em li jiyanek weha digeriyan ku bikarin lê nefes bistînin û me li Rojava ev jiyan peyda kir. Ji bo ewlehiya zarokên xwe, min cihekî ji Rojava baştir nedît. Ez sebzeyên di serayan de bi tendurist mezin dikim û bi vî rengî xizmetê ji gelan re dikim. Ev yek jî min pir kêfxweş dike. Em 6 malbat di vê kooperatîfê de dixebitin. Em bi alîkarî dayîna hevdû, li serayan jiyaneke bi aram dijîn."

Sudoku: Bersiv 52

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 6 | 4 | 9 | 2 | 3 | 8 | 7 | 5 |
| 3 | 9 | 8 | 7 | 1 | 5 | 4 | 6 | 2 |
| 2 | 5 | 7 | 8 | 4 | 6 | 9 | 3 | 1 |
| 6 | 1 | 5 | 3 | 8 | 4 | 2 | 9 | 7 |
| 4 | 2 | 3 | 6 | 7 | 9 | 1 | 5 | 8 |
| 8 | 7 | 9 | 2 | 5 | 1 | 3 | 4 | 6 |
| 5 | 4 | 6 | 1 | 9 | 2 | 7 | 8 | 3 |
| 7 | 3 | 1 | 4 | 6 | 8 | 5 | 2 | 9 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 3 | 7 | 6 | 1 | 4 |

Sudoku:Pirs 53

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | | | | | | 2 | |
| | 7 | 1 | | 6 | | 5 | 9 | |
| | | 6 | | 7 | | | | 8 |
| 2 | 3 | | 6 | | 5 | | | |
| | 9 | | | | | | 5 | |
| | | | 3 | | 7 | | 1 | 2 |
| 3 | | | | 5 | | 7 | | |
| | 1 | 4 | | 3 | | 2 | 9 | |
| | 8 | | | | | | | 5 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Serê wî bi benê xav girê da:**
- Xapand.

**Serê wî bi tayê xav girê da:**
- Bi heman wateyê.

**Sola şeytên çep dixe piyê wî:**
- Pir jîr e; ti kes nikare bixapîne; dikare her kesî bixapîne.

**Tevin li ber çêkirin:**
- Ji bo ku zererê bidiyê plan çêkirin; xapand.

**Toroqa wî danîn ser nanê wî:**
-Xapandin; qîmet nedanê; tiştek bi destê wî neket.

**Tu çawa siwarê exte yî, te çawa nivîna xwe ji bazirgan re hiştiye:**
- Heyfa te ku tu hatî xapandin; ewqas te pesnê xwe dida, yekî biyanî tu xapandî.

**Vedikeve laş e, radibe baş e:**
- Derdora xwe dixapîne; zexeliyê dike.

**Vinevin ji min, hingiv ji te:**
- Ezê xweş bikim, tu jî berhemê wê bide hev.

Ji bo kesê dixwaze bixapîne tê gotin

**Weke Mamê Mûs lê kirin:**
- Perîşan kirin; rezîl kirin; pir êşandin; xapandin; nizane ka çawa hat xapandin.

**Xêra wî biqosk e:**
- Xêra wî ji bo xapandinê ye.

**Xiltê ser davikê ye:**
- Ji bo xapandinê ye; hîle tê de heye; lîstik e; jê bawer nekin.

**Xwe xist bin çengê wî:**
- Xapand.

### Li ser behaneyan

**Ard li ser werîs radixe:**
- Naxwaze bike; naxwaze bide; behaneyên bêwate nîşan dide.

Bi hêceta sergîna diçe gundê Mexîna.
- Bi hêceta tiştekî tiştekî din dike; karê wî yê ku li ber çavan xuya dike hêcet e, armanca wî tişteke din e; karê wî yê bingehî tişteke din e.

Mexîna: Ji Mesîhiyan re tê gotin

**Da ber rûyê xwe:**
- Sedem anîn; behane nîşan dan.

Dema bavê qîzê nexwaze bide qelenê wê zêde dike.
- Dema mirovek nexwaze tiştekî bike behaneyekê peyda dike.

**Dema pisîk çêlîka xwe dixwe dibêje mişk e û dixwe:**
- Dema yek tiştekî nebaş dike behaneya wê jî dibîne.

**Dema nêçîra min tê gûyê tajiya min tê:**
- Dema karekî min dikeve cem hevalê min karekî ji xwe re dertîne.

Dilê yekî çûbû goştê kerê, digot; **guhên wî weke yên kêrvoşikê ne:**
- Li behaneyan digere.

**Garis li ser werîs radixe:**
- Naxwaze bike; naxwaze bide; behaneyên bêwate nîşan dide.

Gotin mirtibo bistirîne, got, tiliya **min kul e:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# KOMPLOYA MEZIN A GLADÎOYÊ ...Derketina Ji Sûriyê...(1)




Derketina ji Sûrî bi operasyona NATO-Gladîo'yê re têkildar e. Eger em jihevcudabûna di nava artêşa Tirk de û Gladîo'yê li ber çavan negirin, em nikarin vê operasyonê rast şîrove bikin. Bi qasî tê yeqînkirin, Serokatiya Fermandariya Giştî ya I. Hakki Karadayi û ya Huseyin Kivrikoglu serdestî her tiştî nebûn.**R-4**

# 'Dagirkeriya Tirk zagonên navneteweyî binpê dike'



Xufran Xelef destnîşan kir ku dagirkeriya Tirk bi êrişên xwe yên hovane yên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hedefgirtina mirov û binesaziyê, zagon û pîvanên navnetewî binpê dike.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1141 | 7-Sibat- 2024 | www.ronahi.net/ku/

# KOMPLOYA NAVNETEWEYÎ PÊVAJOYA QIRKIRINA GELÊ KURD E

Di 9'ê Cotmeha sala 1998'an de, di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de li dijî Tevgera Azadiyê, gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz Komploya Navneteweyî hate destpêkirin û heta niha berdewam e. Lê bi saya berxwedana dîrokî ya Rêber Apo û Tevgera Azadiyê komplo negihişt armanca xwe.**R-3**





# Jinên ku bi keda destên xwe dijîn



Di nava kar û xebatên rojane yê jiyanê de jin bi hêz û hezkirina xwe di hemû warî de xwe isbat kiriye. Jinên bajarê Qamişlo destnîşan kirin ku ew cihê xwe di nava civakê de û bi keda destê xwe digrin.**R-2**

# 'Gelê Efrînê bi lehengî muhra xwe li dîrokê da'



Efrîn muhra xwe li dîroka têkoşîn û berxwedaniya Kurdistanê xist. Li ser xeta têkoşîn û welatparêziyê gel û jinên vî welatî li pişt eniya şer kêliyên vîn, hêz, bawerî û berxwedanê nivîsandin.**R-6**

# 'Hunermend wijdanê gelê xwe ye'



Hunermenda jin Tizyal Çawîş diyar kir ku ew ji malbateke hunerî bû û ji 9 saliya xwe ve wê di nav karê hunerê de cihê xwe girt. Herwiha Tizyal destnîşan kir ku herî zêdê dayika wê desteke daye û banor lê kir da ku bibe hunermendeke serkeftî.**R-7**

Kampa Holê kirine perestgeha jinên DAIŞ`î — Nehîr Pale R-2


Êdî mijar nema şerê DAIŞ'ê tenê ye! — Dilyar Cizîrî R-4


Ji Meşa Romayê ber bi Meşa Kolnê — Farûk Sakik R-5

Li Kurdan xistin serbest e! — Zekî Bedran R-5


Modêla Civaka Sivîl — Rohat Bulut R-6


Pirojeya 100 berhemên Kurdî... nêrîn û têbînî.! — Kemal Necim R-7

# Jinên ku bi keda destên xwe dijîn

Di nava kar û xebatên rojane yê jiyanê de jin bi hêz û hezkirina xwe di hemû warî de xwe isbat kiriye. Jinên bajarê Qamişlo destnîşan kirin ku ew cihê xwe di nava civakê de û bi keda destê xwe digrin.

Emîna Mihemed/Qamişlo

Berî salên 2000`an li Sûriyê jin ji tevahiya mafên xwe bê par dima, di civakê de rola wê hatibû çewisandin. Ji aliyê hişmendiya desthilat ve ji hemû milî ve li ser wê zext dihat kirin. Lê piştî Şoreşa Rojava ku jinê pêşengtî jê re kir, jin di tevahiya qadên jiyanê de bû xwedî roleke sereke û bû pêşengê civakê. Jinên Rojava bi berxwedan û têkoşîna xwe ji tevahiya jinên cîhanê re bûn sembol. Jinên kedkar jî bi karê xwe hebûn û nasnameya xwe ji civakê re isbat kirin.
Girêdayî kar û keda jinên bajarê Qamişlo di jiyanê de, kedkarên jin ji rojnameya me re axivîn.

**'Ez ji karê xwe hezdikim'**

Yek ji xebatkarên tendirustiyê bi navê Nûr Yûsiv diyar kir ku bi xwesteka xwe vî karî dike û wiha got: "Ez ji bajarê Qamişlo me temenê min 22` salî ye, ev nêzî 6`mehane ku ez kar û xebatê tenduristiyê dikim. Herwiha xwesteka min ji vî karî re hebû û min jêhatiya xwe di vî karî de dît. Ji ber wê yekê ez hatim vî karî û malbata min jî piştgirtiya min kir da ku ez bighêjim xwesteka xwe û tu astengî li pêşiya min tune ne. Ji ber ku ev xwesteka min e, û bi karê xwe kêfxweşim. Herwiha jin ne tenê ji malê reye, hêza jinê ji her karî re heye. Jin dikare her tiştî bike, di demên berê de jin nikarîbû kar bike û malbatê jî derfet nedida vê yekê. Lê aniha bûye derfet li pêşiya jinê vebûye ku her karî bike û xwe bi rêk û pêk bike. Ez bi hezkirin nêzî vî karî dibim herwiha jin bi hêzeke mezin cihê xwe di nava civakê de digire. "



Nûr Yûsiv



Emanî Hebîb

**'Xwesteka min a kar hişt ku ez xwe li pêş bixim'**

Xebatkara jin ya bi navê Emanî Hebîb diyarkir ku jinê anha û yên berê ne weke hevin û guhertinek baş çêbûye û wiha anî ser ziman: "Ez ji Baiarê Qamişlo me, temenê min 30`salî ye. Di sala 2011`an de xwendina min bi dawî bû, min li Zanîgeha Şehbayê dixwend biranşê min yê zanista biskolojîk bû, min gelek astengî dîtin di xwendina xwe de,piştî ku min xwendina xwe bi dawî kir min xwest ku ez kar bikim û di mal de nemînim ji ber rewşa malbatî û xwesteka min a kar jî hebû ez çûm karê çap û wênekêşiyê û 12`salan ez di vî karî de mam. Min ji dev karê xwe berneda û min hewil da ku ez xwe û malbata xwe jî bi rêve bibim,piştire min dev ji karê çap û wênekêşiyê berda û anha ez di dikanekê de kar dikim da ku xwe bi rêve bibim.Herwiha di demê berê de jin nikarî bû kar bike, nikarîbû bi tena xwe derkeve. Jinê tişkî şerm ji xwere didît, Lê aniha jin dikare xwe pêşinyar bike û di her derê de kar bike, malbat jî pişgirtiya wan digirin ji bo ku serkeftî bin û li gor xwe bin û xwestekên xwe bi cih bînin."

# Jinên ku mohra xwe li dîrokê xistine – 1

Navenda Nûçeyan

**Hêza jinan bêguman hêzeke taybet û bêhempa ye. Gelek jinên ku mohra xwe li dîrokê xistine hene. Ji siyasetê heta hunerê, ji zanistê heta karkeriyê jinên wisa bi hêz û bêhempa hene ku bi kiryarên xwe ve, berê dîrokê guhertine û deriyên zanistê ji cîhanê re vekirine. Wek mînak meriv dikare bi sedan, bi hezaran jin bijimêre. Hêza jinan, ji hemû mirovahiyê re qîriyaye.**

Bêguman gelek jinên kurd ên helbestvan, nivîskar, zanist, hunermend û siyasetmedar hene ku bi serkeftinên xwe ve navên xwe bi tîpên zêrîn di dîrokê de nivîsîne.

**Mestûre Erdelan – Mestûre Kurdistanî (1804-1848)**

Yek ji van jinên kurd, Mah Şeref Xanima Kurdistaniye ku helbestvan, nivîskar û dîroknasa ewilî ya jin a Rojhilata Navîn e. Di sala 1804'an de li bajarê Sine ya rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Bavê wê Ebûl Hesen Beg ji malbata Qadirî bû. Malbata Qadirî li mîrgeha Erdelanê malbateke xuyanî û ronakbîr bû, bi huner, zanist û dîrokê eleqedar dibûn.
Dayika wê ji malbata wezîrên Kurdistana Sineyê bû. Ango Mestûre Xanim ji malbatek desthilatdar bû.
Mestûre Xanim piştî ku digihêje temenê salên perwerdehiyê bi piştgiriya bavê xwe dest bi xwendinê dike. Lewra di wê serdemê de xwendin ji bo jinan ne tiştekî hêsan bû û ne jî pêwîst bû.
Mestûre Xanimê piraniya helbestên xwe, bi kurdiya zaraveyê goranî nivîsandine. Her wiha bi zimanê farisî û zaraveyê soranî jî helbestên wê hene.
Mestûre Xanim bi vê taybetmendiyê bala zanyarên biyanî jî dikişîne.
Nav û berhemên Mestûre Xanimê di nav Edebiyata Kurdî ya Klasîk de cih digire.

**Vîrgînîa Woolf (1882-1941)**

Nivîskara jin, rexnegir û femînîsta îngîlîz e. Wekî tevgera modernîst ketiye nav rûpelên dîrokê. Woolf di pêşketina romanê de gelek ked daye.
Pirtûkên Vîrgînîa Woolf ji 50 zêdetir ziманan hatine wergerandin.

**Magdalena Carmen Frîda Kahlo Calderon (1907-1954)**

Wênesaza navdar a meksîkî ye. Frîda Kahlo wekî surrealîst were pênasekirin jî bi xwe surrealîzmê red dike.
Wêneyê wê êş û rastiyan nîşan didin. Di wêneyên Frîdayê de çanda Meksîkayê û nasnameya têkoşer a neteweyî tê dîtin.

**Marîe Skłodowska Curîe (1867 –1934)**

Marîe li Polonyayê ji dayik dibe.
Çalakiya wê ya profesyonel di lêkolîna radyoaktîvîteyê de wê Xelata Nobel a Fîzîkê û Xelata Nobelê ya Kîmyayê wergirt.
Piştî lêkolînên ûranyumê radyoaktîvîte kişf kir. Di sala 1903'an de Xelata Nobelê ya Fizîkê di sala 1911'an de jî Xelata Nobel a Kîmyayê wergirt.
Her wiha damezînera zanist a radyolojiyê ye jî. Wê bi xebatên xwe yên serketî mohra xwe serdemekê xistiye.
Marie Skłodowska Curie, jina ewilî ya Xelata Nobelê stend. Her wiha ew zanista jin cara yekem e ku Xelata Nobelê du caran ser hev hilgirtiye.

**Teresa of Calcutta (1910 – 1997)**

Li seranserê cîhanê tê zanîn, Teresa of Calcutta Mîsyonerên Civata Xêrxwaziyê damezirand da ku jiyana xwe, ji bo alîkariya kesên mexdûr veqetîne.
Rahîbe Teresa, di sala 1979-an de Xelata Nobelê ya Aştiyê girt.
Di sala 1950'an de bi destûra Vatîkanê 'Mîsyonerên Civata Xêrxwaziyê' damezirand.
Ev saziya ku bi 12 kesan ve hat damezirandin wisa mezin bû ku li seranserê cîhanê li 450 cihî vebû û 4 hezar rahîbe tê de erkdar bûn.




**Indîra Gandhî (1917 – 1984)**

Mîna bavê xwe, Indira serokwezîra navdar a Hindistanê bû, du caran serokwezîrtî kiriye.
Di dîroka Hindistanê de serokwezîra yekane ya jin e. Her wiha duyemîn kes e ku herî dirêj serokwezîrtî kiriye.

**Carmen Martín Gaîte (1925 – 2000)**

Di jiyana xwe ya nivîskariyê de ji 50'yî zêdetir roman, çîrok, helbest, şano nivîsiye. Gelek xelatên Wejeyê yên Neteweyî hilgirtiye.
Bi saya xebatên xwe yên naskirî ketiye dîroka nivîskarên mezin ên Spanyayê.

**Amelîa Earhart (1897 – 1937)**

Amelia Earhart jina yekem a pîlot e ku di ser Okyanûsa Atlantîk re bi tena serê xwe bi balafirê derbas bûye.
Her wiha Amelia kesayetiyeke wisa ye ku wê demê di civakê de maf û têkoşîna jinan temsîl dike.

**Rosa Parks (1913 – 2005)**

Rosa Parks di sala 1943'an de tev li Tevgera Mafên Welatiyên Amerîkayê bû. Di sala 1955'an de li parêzgeha Alabamayê li dijî cihêkarî û zexta li ser çermreşan bû pêşenga xwepêşandanan.

**Malala Yousafzaî (1997 – niha)**

Malala ya ji Pakistanê çalakvaneke jêhatiye ku ji bo perwerdeya jinan dixebite.
Wê di sala 2014'an de Xelata Aştiyê ya Nobelê girt û bû kesa herî ciwan ku di dîrokê de cara ewil kesek 17 saliya xwe de Xelata Nobelê girtiye. Xebatên wê li ser mafên mirovan û bi taybetî mafên jinan e.

**Emma Ihrer (1857-1911)**

Sendîkavana sosyalîst û parêzvana mafê mirovan e ku ji tevgera jinên alman navê herî tê nasîn e.
Di sala 1885'an de Komeleya Nûneriya Berjewendiyên Jinên Karker vekir û pêwistiyên jinên karker kir mijara xwe ya sereke.
Piştî ku li Almanyayê rêxistina jinên karker pêşket di sala 1898'an de pirtûka bi navê 'Di têkoşîna çînan de jinên karker' dinivîse.

**Ji Pênûsa Jin**

## Kampa Holê kirine perestgeha jinên DAIŞ`î

Nehîr Pale

Sumeriyan sala 3500 BZ. jin li perestgehên xwe kirin kole, ew ji siyasetê dûrxistin, di rêvebirina civakê de rol jê standin û ew ji bo berjewendiyên xwe dan bi kar anîn. Zîhniyeta Sûmeriyan heyanî roja îro berdewam dike. Dewletên navdewletî jî îro heman rêbazî li hemberî jinê didin bi kar anîn û kampa Holê ji bo jinên DAIŞ`ê kirine stargeh.
Jinên çeteyên DAIŞ`ê li kampa Holê neslekî herî xeter mezin dikin. Ew jin hemû hemwelatiyên dewletên derveyî Sûrî ne, zagonî ji Rêveberiya Xweser nayê xwestin ku berpirsyartiya wan rabike. Lê ev zêdetirî 5 sale ku ew jin li kampa Holê ne û xwe birêxistin dikin.
Li kampa Holê li ser destê jinên çeteyên DAIŞ`ê buyerên gelekî giran qewimîn. Jinên ku li ser gotinên wan nemeşîn ew bi rêbazên gelekî qirêj qetil kirin, xendekan dikolin, çek vedişêrin, çete dihewînin û diparêzin. Tişta balkêş ew e ku her diçe hejmara zarokên wan zêde dibin. Ew jinên çeteyên DAIŞ`ê wan zarokan li ser kêr û amûrên tûj fêrî dijminayî û kuştinê dikin. Eger QSD û hêzên ewlekariya hindirîn di mijara ewlehiyê de tedbîr negrin ew jinên DAIŞ`ê wê kampa Holê bikin navenda çeteyên DAIŞ`ê.
Zîhniyeta DAIŞ`ê li ser xebatên jin xeteriyeke mezin e. Ew jinên ku zîhniyeta wan a DAIŞ`e û dikevin nava civakê de wê bandoreke neyînî li ser civakê bikin. Jinên DAIŞ`ê wê her tim hewl bidin ku derbe li têkoşîna jin bidin.
Piştî sala 2014`an çeteyên DAIŞ`ê gund û bajarên Sûriyeyê dagirkirin, ji aliyê zîhnî ve gelekî bandorekî neyînî li ser civakê kir. Hemleya xwe ya dagirkirinê di bin navê ol de kirin, jin li bazarên El-Nexase firotin, ew weke cariye dan bi kar anîn, destdirêjî li wan kirin û jinên ku piçekî canê wan xuyakiribane ew işkence dikirin, êdî her tiştê jinê guneh û şerm bû. Di bin navê jinê zîne kiriye ew bi destê mêran recm dikirin. Çeteyên DAIŞ`ê kiryarên herî qirêj li ser jinê dan meşandin û jin anîn rewşa ku qet ji malên xwe dernekevin.
Li kampa Holê niha jinên çeteyên DAIŞ`ê heman rêbazan li hemberî jinan didin meşandin. Bi dehan jin kuştin û zîhniyeta çeteyên DAIŞ`ê li ser civakê û jinê ferz dikin.
Di hemleya Mirovî û Ewlehî ya ku hêzên ewlekariyê û leşkerî 27`ê Çile dest pê kiribûn gelek hucreyên veşartî yên çeteyên DAIŞ`ê li ciyê jinên DAIŞ`î hatin girtin. Ji bo hemle neyê kirin zarok û jinên DAIŞ`ê êrîş dikirin. Hêzên leşkerî ev bûye zêdetirî 9 rojan dest bi hemlê kirine û her roj cebilxane li kampa Holê tê girtin.
Jinên çeteyên DAIŞ`ê yên ku li kampa Holê dimînin wê her tim li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xeter bin. Ji aliyê zîhnî û exlaqî ve bi civakê dileyîzin û neslekî ku zîhniyeta DAIŞ'ê dayimî bike mezin dikin. Dewletên Ewrûpa berpirsyartiya van jin û girtiyên DAIŞ`ê ranakin û mîna dewleta Tirk a dagirker her tim hewl didin ku bi riya çeteyên DAIŞ`ê êrîşî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bikin. Dewletên dagirker di pêvajoyên pêş me de wê van jinên DAIŞ`ê ji bo berjewendiyên xwe bidin bi kar anîn.



# 'Hunermend wijdanê gelê xwe ye'

Hunermenda jin Tizyal Çawîş diyar kir ku ew ji malbateke hunerî bû û ji 9 saliya xwe ve wê di nav karê hunerê de cihê xwe girt. Herwiha Tizyal destnîşan kir ku herî zêdê dayika wê desteke daye û banor lê kir da ku bibe hunermendeke serkeftî.

Hunera dengbêjî, stranbêjî û muzîkjeniyê; hunerke mîna tevahiya hunerên din, xwedî taybetmendiyeke cuda ye û nehêsan e, ji ber ku pêwîstiya wê bi hestekî bilind û estetîkê heye. Ev huner li cem gelê kurd xwedî taybetmendiyeke mezin e, herwiha heya astekê berbibiçav pêşketiye.
Li Kurdistanê jinan jî cihê xwe di nava hunerê de girtine û bandoreke mezin li pêşeketina hunerê kirine. Yek ji jinên hunermend ku ev zêdeyî 40 salî ye karê hunerê dike Tizyal Çawîşe.
Hunermenda jin Tizyal Çawîş di darbarê jiyana xwe ya hunerî de ji rojnama me re axivî.
Tizyal Çawîş di sala 1973`yan de li bajarê Efrînê ji dayik bûye, herwiha di nava malbateke hunerî de jiyan dike û giştî malbata wê hunermendin. Dayika wê dengbêj bû û starnên kevnar digotin. Birayê wê û xwişkên wê jî hemî sazbendiyên stranbêjiyê bûn.
Taziyal da xuyakirin ku herî zêde bandora dayika wê lê bûye û dayika wê piştgiriya wê kiriye da ku bibe hunermendeke jîr û jêhatî weke dayika xwe. Tayzil di temenekî biçûk de bi mûzîkê ve hate girêdan, ew di 9 saliya xwe de fêrî sazbendiya amûrên mûzîkê û gotina sitranan bû, herwiha xwendekar bû jî lê xwendina xwe hayanî refa 9`an dewam kir û piştî wê xwendina xwe rawistand. Herwiha ew di sala 192`yan de zewicî û dema ku zarok çêbûn karê hunerê rawestandin.



**'Dengbêjî ji bo jiyana min ronahî ye'**

Tizyal Çawîş da zanîn ku piştî zarokên wê mezin bûn, di sala 2012`an de ew careke din karê xwe yê huneriyê berdewan kir û wiha anî ser ziman: "Ez çûm navenda çand û hunerê ya li bajarê Efrînê û tevilî koma îngîzek bûm, herwiha ez di nava gund de jî bûm rêveberiya xeta Şehîd Munzir ya navçeya Cindirêsê û derdora 10 komînan birêve dibir û dîsa jî karê xwe yê hunerî ne rawestand. Piştî koma Şehîd Berçem hat avakirin min cihê xwe tê de girt, lê dema ku Efrînê di sala 2018`an de hat dagirkirin, ez ji Efrînê derketim û wekî tevahiya Efrîniyan em li herêma Şehbayê bi cih bûn. Di deststpêka derbasbûna Şehbayê de min demekê karê hunerê rawestand û piştre careke din min karê hunerê li herêma Şehbayê dewam kir. Li Şehbayê ez tevlî navenda Çand û Hunerê ya Cemîl Horo bûm. Li aliyekî din min cihê xwe di nava kar û xebatên Rêveberiya Xweser de jî girt. Di dema niha de ez rêveberiya Hîlala Zêrîn ya navenda Şehîd Berçem li Şehbayê dikim û cihê xwe di koma Şehîd Zîlan de digrim. Stran û dengbêjî ronahiya jiyana mine."

**'Hunermend wijdanê gelê xwe ye'**

Hunermenda jin Tizyal Çawîş di dawiya axavtinên xwe de wiha anî ser ziman: "Ji zaroktiya xwe de me soz daye Şehîdan û Rêber Apo ku heta em karibin em ê karê xwe berdewam bikin û tucarî em ji sozên xwe jî venagerin. Bengewaziya min jî ji hemû jinên kurd û jinên cîhanê heye ku yên dengê wan xweşbê yan her amûrekê lê bidê em bi hêvî ne, were ba me û tevlî navenda me bibe. Divê hunermed pêşengtî û ronakbîriyê ji civakê re bikin. Ji ber ku hunermend wijdanê gelê xwe ye."

# Çand û ziman

Her neteweyek xwedî çandekî ye. Têgîna çandê ji reng û dengê neteweyan pêk tê, ev jî hebûna gelan sembolîze dike. Hebûn û tunebûna şaristanî an jî miletan li aliyek girêdayî hêza fizîkî be, li aliyê din jî girêdayî hêza çandê ye. Di nav neteweyan de şermkirina ji axaftina zimanê xwe, pir kêm bûye babet; lê mixabin di nav me de ev yek bûye mijara gotinê, Kengî bi axaftina zimanê xwe em serbilind bûn û me xwe bi rûmet hesiband, wê demê pêşketina zimanê me jî pêkan e. Rast e, ji bilî zimanê xwe, zanîna zimanên biyanî dewlemendî ye ji bo mirovan lê; ne ku mirov li hember zimanên biyanî, zimanê xwe jî biçûk bihêle an jî biçûk bibîne. Bi hewldanên pêşxistin û parastina ziman ancax em dikarin dîroka raboriya xwe bibîr bînin, û dema xwe û siberojên xwe bi zimanê xwe zindî bihêlin. Di vê yekê de pêdivî bi hezkirin û wêrekiyê heye, û li xwedîderketina ziman, him wê diparêze û him jî bi hêz dihêle.
Li ciyê ku em nifşên nû bi zimanê xwe rakin û bi axaftina zimanê xwe serbilind bibin, em ê çima ji axaftina zimanê xwe şerm bikin ku heta em zarokan ji zimanê wan bêpar bihêlin? Heta îro destan û evîn; serborî û lehengî, çîrok û hwd, ku di erdnîgariyên welatê me de hatine jiyankirin; bi şêweyên devkî û nivîskî bi vî zimanî hatine gotin û nivîsandin.
Ev yek jî bi navgîna ziman pêk hatiye û hatiye parastin. Heger Ziman ne xurt be, lê qels û lawaz be; bê şek reseniya wan berheman jî dadikeve. Heke çand wateya hebûnê be, wê demê bi tunekirina çandê re mirovên ku çanda wan tê tunekirin; bîr, raman û rihê wan jî tê tunekirin. Civaka ku ev nirxên wê hatine desteserkirin, dil, bîr, bawerî,raman û rehê wê lawaz û tune be; ew civak, pûç û vala û bêfeyde dibe, pêşketin bi tu awayî ne gengaz e.
Lewra her tim xwe di bin karîgeriya çandeke bihêz û serdest de dibîne. Bi vî awayî ew civaka ku ji neteweyek pêk hatiye ji aliyê çandî ve tune dibe. Ger xwe bi xwe mirov zimanê xwe bê nirx û bê qîmet û piştguh bike, ji parastina wî re nebe alîkar, êdî ji bo lawazkirin û tunekirina wî zimanî pêdivî bi hêzek serwer namîne ku heta ew ziman bê tunekirin.
Em çima qedera zimanê xwe ji hêzên çewsîner re bihêlin ku heta ew li gorî xwe teşeyekê ji tunebûnê bidinê? Hêjayî gotinê ye ku çaxê hêzek serdest xelkekî bixe bin metîngeriya xwe, her wisa lawaz û bê nasname bike; di serî de çanda wî qedexe dike, bermahiyên dîrokî tune dike.
Ji bo ku gel zimanê xwe, ji bîr û baweriyên xwe; bi giştî ji hemû nirxên xwe dûr bikeve, bi hemû awayî qels dike û hemû çavkaniyên wî gelî bi awayekî pêkûtî bêbandor dihêle. Ev yek jî sedama qelsbûn an jî windabûna çandê ye.
Jêder û çavkaniyên puxteyî û nirxên miletekî di zimanê wî de ye. Ev ji bo civakekê sermiyana herî mezin ya çandî ye, ne hewqasî sivik, biçûk û erzanin ku heta bên piştguhkirin. Ji bo çi ji zimanekî hewqas kevn û dewlemend re bê gotin:"Zimanê nenas"?
Sedemê vê gotinê jî herî zêde em bixwe ne! Ger her giya li ser koka xwe şîn dibe; wê demê em reh û rîşalên xwe zindî bihêlin ku giyayê me jî her dem geş û zindî bimîne. Ji ber ku rihê civakek ji çanda wê pêk tê. Divê çand bê parastin ku civak jî çalak û parastî bimîne.
Ez dixwazim dawiya nivîsê jî ji helbesta Boraboz ya bi sernivîsa (Bi hev re) bigirim ku wek helbesta yekemîn ya kurd tê zanîn û dîroka xwe digihêje bi sedan salan heta berî zayînê. Mebest ji vê sernivîsê ji bilî bihevrebûnê, mînakek ji mînakên niviskî ya dîroka kevnar a zimanê kurdî ye. Werin em "bi hev re" zimanê xwe zindî bihêlin, bila zimanê me jî bi kurdî bigere.






**Têbînî**

## Projeya 100 berhemên Kurdî... nêrîn û têbînî.!



Kemal Necim

Di nivîseke berê ya vê quncikê de min behsa girîngiya çanda xelatkirin û rêzgirtina wêjevanan û berhemên wêjeyî yên Kurdî kiribû, ku çawa wêjevanên Kurd û berhemên wêjeyê yên Kurdî sêwî û bê xwedî ne û cihê dax û mixabiniyê ye ku xelateke wêjeyî ya hêja û bilind û bi nirx li ser asta Kurdistanê tune ye.
Di hefteya derbasbûyî de li ser medyaya Kurdî behsa projeyeke girîng û binirx hate kirin. Ew jî projeya 100 berhemên Kurdî yên di pêvajoya 100 salên dawî de derketine hate kirin. Piroje bi boneya sedsaliya peymana Lozanê de, ji hêla komeleya Mala Kurdan a Swîsreyê û hevkariya şaredariya bajarê Lozanê htiye lidarxistin.
Di projeyê de berhemên ku Kurdan di sed salên dawî de, di her warî de afirandine û pêşkêşî çanda mirovahîyê kirine hatine destnîşankirin, sernavê berhemê û hûrgiliyên wê û navê danerê berhemê hatine danasîn. Di lîsteya 100 berheman de, navê berhem û danerên Kurd ên Rojava jî hene mîna Ehmedê Huseynî û Helîm Yûsiv di ware wêjeyê de, Ciwan Haco û Mehmûd Berazî di warê mûzîkê de, Bavê Teyar di warê hunerên sehneyê de, Zuhêr Hesîb û Luqman Ehmed di hunera dîtbarî de, û zanîngehên Rojava û Efrînê jî di warê Peyaneriyê de.
Bê guman lidarxistina projeyeke ewqas berfereh pir girîng e, dê bibe mîna belgeyeke dîrokî û arşîva berhemên Kurdî yên bi bandor, her wiha dê çavên civakê, xwêner, şagirt, lêkolîner û HWD jî bibe ser van berheman. Dê ji bo danerên berheman ên koçbûyî jî bibe rêzgirtin û xelat, herwiha dê ji bo danerên zindî jî bibe cihê şanazî, coş û têvedanê.
Her çiqas xebatkarên projeyê li ser malpêra xwe hin agahî der barê projeyê de weşandine, lê hûrgiliyên wê pir nediyar in. Ango rêbazên bijartin û hibijartina berheman, pisporiya endanên jûriyê û pir hûrgiliyên din jî ne diyar û xuya ne. Hemû kesên ku berhemên wan di nava 100 berhemên sedsalê de hatine destnîşankirin cihê rêzê ne û hêja ne. Lê li ser medyaya civakî hin nêrîn û boçûn xuya kirin, weke; çima navê helbestvanekî pir nenaskirî heye û navê helbestvanekî navdar, naskirî û bi bandor mîna Şêrgo Bêkes tune ye. Ji xwe pir diyar e ku çi xebatek bê kêmanî û kurtî nabe.
Ev xebata projeya 100 berhemên Kurdî, dikare bibe destpêk û rênîşana rêze proje û xebatên di çarçoveya, danasîn, rêzgirtin û xelatkirina berhemdêran û berhemêm wan. Lê pêwîste ku bi awayên cur bi cur, bi afrênerî û hostayî pêk bên.
Li şûna berhemên der barê mijarên cur bi cur de, dikare ji bo her qadeke afrêneriyê çalakiyeke cuda bête lidar xistin, mîna 10 romanên Kurdî, 20 berhemên Helbestê, 20 berhemên der barê mijarên zanistê, yan wêjeyê, yan ziman û HWD. Her wiha li şûna 100 salan dikare berhemên 10 salan, yan berhemên salekê bêne destnîşankirin û danasîn.
Ji bo vê xebatê jî hestyarî, hişyarî û berpirsyarî pêwîst e. Ango pir pêwîste ku sazî û dezgehên pispor û pêwendîdar bêne avakirin. Her wiha pêwîste zana û aqilmend û pispor serpereştiya vê xebatê bikin. Xebateke wiha dê ji bo danasîna behremendî û hilbirîna Kurdan a ramyarî, wêjeyî bibe egerên têvedan û pêşketinê, her wiha dê ji bo daner û afrêner û berhemdêran jî bibe cihê şanaziyê.

# ‘Gelê Efrînê bi lehengî muhra xwe li dîrokê da’

Efrîn muhra xwe li dîroka têkoşîn û berxwedaniya Kurdistanê xist. Li ser xeta têkoşîn û welatparêziyê gel û jinên vî welatî li pişt eniya şer kêliyên vîn, hêz, bawerî û berxwedanê nivîsandin.

**Zana Roj/ Şehba**

Nivîsandina Kêliyên berxwedana serdemê di Efrînê de bû para tavahî gelên welatparêz. Di berxwedaniya 58 rojan de yek ji dîrokên berxwedanê û têkoşîna li hember dijmin bi destê gelê Kurd di Efrînê de hat xêz kirin. Dagirkeriya Tirkiyê bi êrîşên xwe yên li ser herêma Efrînê di 20 ê Çileya 2018 an de, bi hemû hêz û teknîka pêşketî êrişî herêmê kir. Li hember dagirkeriya Tirkiyê gelê Efrînê bi hemû pêkhateyên xwe seferberî îlan kirin û bi rihê parastina xaka xwe tevlî vê cengê bûn. Di oxira vê berxwedaniyê de bi hezarê şehîdan canê xwe fedakirin. Li beramberî wê bi hezaran çîrok û vegotinên kêliyên berxwedanê jî hatin xêzkirin. Dayîka Hemîde Omer Mihemed û Emîna Silêman ji rojnameya me re behsa kêliyên berxwedanê yên 58 roja kirin.

**‘Kêliyên berxwedanê wê her tim zindî bimînin’**

Dayîka Hemîde di destpêkê de êşa salvegera êrîşên dagirkeriyê anî zima û wiha got: “Dema ev dîrok vedigere êş û nalînên dayîkan, qêrînên zarokan û êşa ku roj bi roj bi dehan şervanên vî welatî dihatin oxir kirin tê bîra me. Ev êş li hemberî dagirkeriyê hemû dibû hêrsa têkoşînê û hêza berxwedanê û pêwîste ku em vê yekê ji bîr nekin. Her çiqasî bedelên hatine dayîn giran bûn jî, lê Efrîn bi van qehremanan tê naskirin û bi berxwedana serdemê jî gelê Efrînê muhra xwe li dîroka têkoşîna Kurdistanê da”.



Hemîde Omer Mihemed

**`Çi ji destê min dihat min dikir`**

Dayîka Hemîde di vegotina kêliyên ku jiyan kirine de wiha got: “Em bixwazin ne xwazin şer bi xwe re gelek ziyanan tîne. Lê li kêleka wê jî xebatekî mezin jî ji me dihat xwestin. Di wê demê de di asta yekemîn min cihê xwe din nava hêza parastinê de digirt û me gund, tax û bajarên xwe diparastin. Her wiha ez tevlî komên ku xwarin ji şervanan re amededikirin bûm, bi vî rengî me bi rojan ji bo eniyên şer xwarin amede dikir. Di wan kêliyan de me didît pîrejinên gelek temen mezin bi hêza xwe tevlî van giropan dibûn da ku para wan jî di vê têkoşînê de hebe. Her wiha ez derbasî nexwaşxaneyê jî bûm ji bo bibim alîkar bi hevalên li wir re. Bi kurtasî weke dayîkeke Efrînî çi ji destê min dihat min dikir. Tê bîra min şervanek birîndar bû dema hate ser hişê xwe yekser rabû û got ezê biçim eniya şer. Wê demê min jê re got birîna te di lingê te de ye tu nikarî rabê, qêrîn û hawara ku ji bona hevalên xwe dikir heyanî niha jî hîn di guhê min de ye. bi yek gotinê got “Min efu bikin ku ez nikarim li gel we bim”. Bi dehan hurguliyî û mînakên wiha di wê demê de me dîtin û jiyan kirin, ku tu kes nikare qehremantiya dihate kirin nebîne û înkar bike”.



Emîne Silêman

**`Di rojekê de 3 perçeyên ji kezebê hatin oxir kirin`**

Dayîka Hemîde anî zima ku dayîkên Şehîdan bi jankêşiya oxirkirina kezebên xwe hêz û moral didan hev û wiha pê de çû: “Bila dîrok van kêliyan baş binivsîne, Efrîn hêja bû ku dayîkek di rojekê de 3 giyanan ji kezeba xwe tevlî kerwanên şehîdan bike. Ew hêza ku didan hev wan dayîkan, bi jankêşiya oxirkirina kezebên xwe ji hev re dibûn hêz û moral. Ka wê çawa dîrok van dayîkan ji bîr bike?. Merasîmên şehîdan bi giraniya êşa wê bibû weke oxirkirina bûk û zavayên welat”.

**‘Em mil bi mil li kêleka şervanên azadiyê bûm’**

Emîne diyar kir ku jinên Efrînê weke şervanan nêzî pêvajoyê bûn û wiha got: “Ez ne weke dayîkekê tevlî vê pêvajoyê bûm, min û bi hezaran ji dayîkan jî em weke şervanan tevlî pêvajoyê bûn. Di hemû kêliyên berxwedanê de me kar kir û me gav paş de neavêt. Li hemberî dagirkeriya ku şerê Kurd û Kurdistanê dike, me bi berxwedan û têkoşîna ku ji Efrînê li hember hêzên navnetewî destpêkir û berbelavî tevahî cîhanê bû. Bi vê bîr û baweriya mezin em tevlî kar û xebatê bûn û em her tim mil bi mil li kêleka şervanên azadiyê di eniyên şer û berxwedanêdebûn.

**‘Rojên bi êş û birîn’**

Emîne anî ziman ku çîrokeke din ji çîrokên berxwedaniyê, çîroka dayîka ku piştî ku bi çavê xwe dibîne zarok şehîd dikevin sê rojan lal û ker bû û wiha bûyer vegot: “Li gundê Tirindê me jiyan dikir. Em hîn ji gundê xwe derneketibûn. Zarokên min û yên cîranan çûn ku nan ji mer re bînin. Bi derketina ji derî teqîn çêbû û di wê navberê de dema ku em derketin me dît ku laşê 4 zarokan di nava xwînê de li erdêne û rewşa heyî ji bona me pir zor û zehmet bû. Ji wan 4 zarokan 3 şehîd ketin û dema ku dayik vê yekê bi çavê xwe dibîne 3 rojan lal û ker dimîne. Dayika ku behsa wê tê kirin jî heyanî niha li Şehbayê dimîne, lê piştî wê bûyera ku bi çavê xwe dîtî û nekarî ku tehemul bike hişê xwe wendadike”.

## Xwenasîn



### Modêla Civaka Sivîl

**Rohat Bulut**

Hin modelên rêveberiyê yên civakî hene ku yek ji wan jî civaka sivîl e. Di rewşa heyî de ev modêl gelekî li civaka kurd tê. Dema em bala xwe didinê em dibînin ku Modêla Civaka Sivîl, kêmbe jî ji zextên otorîteya siyasî dûr e. Avaniya demokratîk a ku di civakê de heye û sazumaniya wê girêdayî hewldana bidestxistina hin mafan e. Yanî rewşeke serbixwe ya ji derveyî saziyên dewletê ku civak xwe bi xwe rêve dibe ye. Ji xwe di xwezaya civakê de qebûlkirina otorîteya dewletê tune ye.

Baş e, ev modêl çi ye û çawa pêş ketiye? Dema em bala xwe didin têgeha civaka sivîl, di destpêkê de rewşa medenî û şaristanî ya di encama şaristaniyê de pênase dike. Ev modêl, di sedsala 18’mîn de ji bo cudakirina şêwaza rêveberiya Rojavayî ji despotîzma Rojhilatî wekî têgînek polîtîk hatiye bikaranîn. Lê belê, têgîna civaka sivîl bi giranî ji hêla Hobbes û Locke ve hatiye bikaranîn û di teorîsyenên peymana civakî de girîngî girtiye.

Wekî tê zanîn Thomas Hobbes fîlozofekî Îngîlîz e ku di felsefeyê de materyalîzm, di exlaqê de kêfî, di siyasetê de jî monarşî qebûl kiriye. Berhema wî ya herî naskirî, “Levîathan” e ku di sala 1651 de derketiye ku ji bo Rojava (Ewropa) dibe bingeha felsefeya siyasî û vê rêçê dişopîn e. John Locke jî fîlozofekî Îngilîz e û pêşengê lîberalîzma klasîk e. Ew yekem nivîskar e ku karîbû ramanên bingehîn ên demokrasiya destûrî bi rengekî hevgirtî bi kurtî bicivîne. Ew yek ji girîngtirîn ramyarê sedsala 17’în e. Ramyarên wekî Hobes û Locke, dema diyar dikin ku bêyî otorîteya siyasî dibe, wê demê pêdiviya wan bi têgeheke ku bêyî dewlet jî jiyan pêkan e heye û li şûna dewletê têgeha ku vê rewşê diyar bike jî têgeha civaka sivîl e.

Li gorî vê yekê civaka sivîl çarçoveyeke giştî ya ku tê de têkiliyên aborî, pêkhateyên malbatî, saziyên olî û hwd bêyî desthilatdariya siyasî hebûna xwe didomînin diyar dike. Lê divê neyê jibîrkirin ku têgeha civaka sivîl têgeheke analîtîk e, ji ber ku civaka sivîl bêyî otorîteya polîtîk nabe. Hegel û Marx jî derbarê civaka sivîl de xwedî nêrîn in. Hegel, civaka sîvîl weke saziyeke navber a di navbera têkiliyên siyasî yên malbat û dewletê de pênase dike. Li gorî Karl Marx jî civaka sivîl tevahiya têkiliyên civakî-aborî û hêzên hilberînê temsîl dike. Her wiha em dibînin ku ramyar, siyasetmedar û teorîsyenê îtalî Antonio Francesco Gramscî jî vê têgihîştina civaka sivîl bi tevahî dipejirîne. Yanî li gorî vê nêrînê civaka sivîl di navbera kiryarên bi zorê û destwerdanên dewletê û qada aborî ya ji hilberînê pêk tê de ye. Li gorî vê yekê jî civaka sivîl qada jiyana civakî ye ku weke qada hemwelatîbûna taybet û erêkirina takekesî derdikeve pêş.

Lê belê dema em dikolin, dibinîn ku têgîna Civaka Sivîl, di destpêka sedsala 19’emîn de hatiye pêşxistin, di dawiya sedsala 20’emîn de jî zêde derdikeve pêş û pir populer dibe. Di eslê xwe de, ev têgîn di rewşa berevajiya “dewletê” de dihat bikaranîn. Lewre ev dihahat wê wateyê ku di sazî û dezgehên dewletê de civak tune ye, lewma jî dewlet bi awayekî ne rewa ye. Di vir de em vê jê derdixin, ango ev tê wateya ku divê “civaka sivîl” bi hêz bibe ku zext, pêkûtî û otorîteya dewletê li ser civakê kêm bibe.

# Şaredariya Gel ji pirsgirêkên Civakê re dibe riya çareseriyê

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Endama beşê fenî ya Ofîsa lêkolînan a Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo Şîlan Xilêf diyar kir ku Şaredariya Gel her sal pirojeyên xwe li gorî pêwîstiya civakê dide meşandin û got, em li gorî derfetên xwe hewil didin ku ji tevahiya pirsgirêkên welatiyan re bibin cihê çareseriyê.**

Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo di dawiya sala 2012`an de hatiye avakirin. Ji destpêka damezrandina wê ve û heta niha xebatên xizmetguzarî ji civakê re dide meşandin û bajar bi rêxistin dike, pirsgirêkên di nava bajar de çareser dike û ji bo tendirustiya gel çavdêriya bazaran dike, di heman demê de bexçeyan paqij dike û projeyên paqijkirinê pêk tîne. Herwiha salane li gorî pêwîstiya gel projeyan dide avakirin.Di heman demê de gelek beşan digire nav xwe. Beşên ku di nava şaredariyê de cih digirin evin; Ofîsa Tenduristî, Ofîsa Jinê, Ofîsa kenalên avqirêjiyê, Ofîsa veguhestinê, Ofîsa Fenî, herwiha Ofîsa fenî belavî van beşan dibe, mîna Ofîsa avakirinê, Gilî, Tebogirafî, di heman demê de, Ofîsa fenî li ser muxalefeyên di nava bajar de disekin e. Ofîsa ekolojîk paqijiya bajar girêdayî wê ye, Ofîsa Tenduristiyê bi tenduristiya bazarê ve mijol dibe û rojane gerên wan di nava bajar de pêk tên. Ofîsa hiqoqî çi pirsgirêkê derkevin û giliyê hebin ew pê radibin. Rawestgeha Şaredariyê,



beşek taybet a xizmetên paqijkirinê, Beşê Avê, Dîwana Şaredariyê, Beşê Têkiliyan ew jî pêşwaziya giliyan dike û daxwazên heyî ji aliyên Têkildar re rêdike. Beşê Hiqoqî, Komîta Ceneratoran ew jî li ser ceneratoran disekine, ji bo dema pirsgirêkên ceneratoran çareser bike. Ofîsa ekolojîk jî li ser paqijkirina bajar disekin e, herwiha karkerên taybet bi vî beşî hene û Ofîsa Bexçeyan û Ofîsa Ragihandinê.

Derbarê asta kar û xebatên Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo endama Beşa Fenî ya Ofîsa Lêkolînan a Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo Şîlan Xilêf ji rojnameya me re axivî

Şîlan Xilêf diyar kir ku pirojeyên Şaredariya Gel li gorî pêwîstiya civakê ne û wiha got: “Şaredariya Gel bi armanca xizmeta civakê kar û xebatên xwe dide meşandin. Her sal şaredarî pirojeyên xwe nû dike, pirojeyên Şaredariyê jî li gorî pêwîstiya civakê tên avakirin û pêk anîn. Şaredariya Gel bi gelek kar û xebatên girîng mijol dibe, bexçeyan li bajar ava dike, li paqijiya bajar baldariyê dike, di heman demê de ji bo parastina tenduristiyê şopandina bazarê dike, riyên bajar jî çêdike û her dem di xizmeta civakê de ye. Herwiha di sala bûrî de me kar û xebatên baş di nava bajar de da meşandin, dibe ku derengî di destpêkirina pirojeyan de bû, lê ev jî bi sedema hîn ne erêkirina pirojeyan bû.”

**‘Şaredariya gel bi hemû derfetên xwe xebatê dide meşandin’**

Şîlan Xilêf pirojeyên ku Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo di sala 2023`an de pê rabibûn wiha anî ziman: “Di sala 2023`an de pirojeyên ku me pêk anîn jî ev bûn; Beqaya li hin riyên taxan wek, Umfirsan, Hilêliyê, Hîmo, Cimayê û li taxa Tey hatin rastkirin. Hin riyên taxa Hilko, Cimayê, Qenat Siwês, Elaya, Enteriyê û Cirnikê hatin ziftkirin. Xebatên kenalên avqirêjî jî li gelek cihan hat kirin, ji xwe hin tax pêwîstiya wan boriyên ku firehbûna wan 40.cm hebû û hin pêwîstiya wan bi boriyên ku firehiya wan 30.cm hebû, me ew jî bi dest anî û li Nemetiyê, Cimayê, Qenat Siwês, Hilko, Navkorê û li gundê Sêgirka pêk hat. Kenalê ava baranê jî li bajarê Qamişlo hatin belavkirin, hin jê li aliyê Xerbî û hin li aliyê Şerqî hatin belavkirin, li aliyê xerbî li Hilêliyê, Hilko, Kornîş, Hîzam xebat hat kirin û li aliyê Şerqî jî li Elaya, Enteriyê, Cirnikê, Qenat Siwês bû, hejmara wan jî 63 kenalê avê bûn. Di heman demê de me li bazara zebzeyan entirlok danî. Niha jî em xebatê enterlokan li çerxeya Şehîd Yûsif Gilo didin meşandin, heta niha bi dawî nebûye, lê di demên nêz de wê bi dawî bibe. Li riyên bajarê Qamişlo sererastirin jî pêk hat. Xebatên Qeşartina riyên bajêr jî hat kirin, ew jî li giştî Qamişlo û me bi hemû hewldanên xwe pirgirêkên heyî yên bajêr çarser kirin. Ji xwe sedema derengbûna pirojeyên me jî ewbû ku Şaredarî hevpeyman bi Kampaniya Zagros re danîbû û Kampaniya Zagros li çêkirina riya Embara kar dikir, ji bo wê derengî di xebatên pirojeyên me de bûn.”

**‘Bi êrişan hêza kar û xebatên me ranaweste’**

Şîlan Xilêf axaftina xwe wiha qedan: “Pirojeyên ku şaredariyê di sala 2024`an de daniyê pêşiya xwe evin; Kenalên Avqirêjî, Devên rîkaran û Kenalên ava baranê ye. Ev pirojey ji aliyên Têkildar re hatine rêkirin û dema ku erêkirina wan bên em dest bi kar û xebatên pirojeyên xwe bikin. Herwiha êrişên dawî yên dewleta Tirk a dagirker yên li ser binesaziya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bo sedema qutbûna elktirîk, gaz û kêmbûna avê jî, lê tevî vê yekê jî kar û xebatên me nehatin rawestandin û em her dem bi biryarin ku di kar û xebatên xwe de berdewambin. Di heman demê de êrişên dewleta Tirk a dagirker, hêza kar û xebatên me ranawestînin.”



# Komploya Navneteweyî Pêvajoya qirkirina gelê kurd e

Di 9’ê Cotmeha sala 1998’an de, di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de li dijî Tevgera Azadiyê, gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz Komploya Navneteweyî hate destpêkirin û heta niha berdewam e. Lê bi saya berxwedana dîrokî ya Rêber Apo û Tevgera Azadiyê komplo negihişt armanca xwe.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Hêzên sermayedarê cîhanî, serdest û dijminê civak û gelên bindest ji bo tesfiyekirina gelê Kurd û Tevgera Azadiya Kurd, hemû gelên azadîxwaz, tevger û kesayetên demokrat û sosyalîst di 9’ê Cotmeha 1998’an dli dijî Rêber Abdullah Ocalan Ocalan dest bi Komploya Navneteweyî kirin. Ji ber ku di hemû cîhanê de ji dost û dijminê gele Kurd û tevgerên azadiyê yê gelê Kurd re hate îspatkirin ku alternatîfa herî bi hêz ya sîstema demokratîk û azadiya gelên bindest projeya Rêber Apo ya konfederalîzma demokratik û siyaseta xeta sêyemîn e, sîstema modernîteya kaptalîzim û dewlet-netewe, hêzên serdest û hevkarên wan ji felsefeya Rêber Apo bi tirs bûn û ketin nava liv û tevgerê û cihê xwe di komploya navneteweyî de girtin.

**Gava destpêkê ya komploya bêbext**

Fermandarê Hêzên Bejahiyê yê Artêşa Tirk a dagirker yê wê demê Atîlla Ateş di 18’ê Îlona 1998’an de bi awayekî eşkere gef li Sûriyeyê xwar û ji hikumeta Sûriyê xwest ku Rêber Apo ji Sûriyê bê derxistin. Her wiha Serokkomarê Tirkiyeyê yê demê Suleyman Demîrel jî li Parlamentoya Tirk bi heman awayî gef li Sûriyeyê xwar.

Dewleta Tirk bi piştgiriya Emerîka, Îsraîl û Brîtanyayê têkildarî Rêber Abdullah Ocalan gefa li ser Sûriyeyê zêdetir kirin. Di cîhana Ereban de jî serokê Misrê Husnî Mubarek ketibû dewrê. NATO û welatên Ewropayê jî bi heman mebestê ketibûn nav hewldanan. Dewleta Tirk 35 hezar leşker li ser sînorê Sûriyeyê bi cih kiribû. Di encam de Rêber Abdullah Ocalan biryara terkkirina Sûriyeyê da.

**Hêzên ku beşdarbûn**

Bi awayekî rastersat DYE, Brîtanya, Îsraîl, Yewnanistan, Fransa, Hollanda, Rûsya, Elmanya, Kenya, û Misr tevlî nexşeya vê komployê bûn. Herwiha gelek hêz û tevgerên herêmê jî beşdarî komployê bûn. Rêber Abdullah Ocalan derbarê destpêkirina komployê û rola Sûriyê wiha got: “Serokê DYE’yê Clinton ji bo derxistina min ji Sûriyeyê guftûgo bike, carekê li Şamê û cara din jî li Swîsreyê ji çar saetan zêdetir du civîn bi serokdewlet Hafiz Esed re pêk anîn. Hafiz Esed di wan hevdîtinan de li girîngiya mijarê hayedar bû. Ji bo xwe di cih de dît ku pêvajoyê dirêj bike. Ji bo demekê be jî ji min derketina ji Sûrî nexwest. Li dijî Tirkiyê dixwest min weke hêmaneke tewazunê heta dawiyê binirxîne. Lê min jî Sûriyeyê dahf dida ji bo bibe xwedî helwesteke stratejîk. Lê hêza min û rewşa min derfet û îmkan nedidan ku ez di vê de bi ser bikevim”.

Rêber Abdullah Ocalan di axaftineke xwe ya li ser wê demê de ragihandibû ku li pêşiya wî du alternatîf hebûn; yek jê derketina serê çiyê, ya din jî çûyîna Ewropayê bû, wî jî çûyîna Ewropayê hilbijartiye ji ber ku xwestiye pirsgirêka Kurd bi rêya siyasî û diyalogê çareser bike. Rêber Abdullah Ocalan di 7’ê Cotmehê de bi Wezîrê Ragihandinê yê wê demê yê Yewnanîstanê Konstantînos



Bantoûvas ê hat Sûriyeyê re hevdîtin kir. Konstantînos soz da ku li Yewnanîstanê ew ê alîkariya çareseriya pirsgirêkê bikin. Di vê dema ku ji bo sûîqestê jî rêxistinên îstîxbaratê dabûn dû Rêber Abdullah Ocalan ku cihê wî tespît bikin, mayîna Ocalan li Sûriyeyê bi giştî jî li Rojhilata Navîn zehmet bû.

Rêber Abdullah Ocalan di 9’ê Cotmeha sala 1998’an de ji Sûriyeyê derket. Bi bablafira Rêyên Hewayî yên Sûriyeyê çû Yewnanîstanê. Banteoûvas ê ku soz da Rêber Abdullah Ocalan diviyabû ew li balafirgehê pêşwazî bikira, lê li balafirgehê ew tinebû. Piştî ku daket balafirgeha Atînayê sozên ji Rêber Abdullah Ocalan re hat dayîn, bi cih nehat anîn. Rêber Abdullah Ocalan berê xwe da Moskowayê û 33 rojan li Rûsyayê ma. Di vê demê de Rêber Abdullah Ocalan daxwaza penaberiya siyasî li Rûsyayê kir. Di 4’ê Mijdarê de Meclîsa Dûma, 298 parlametneran pêşnûem biryara ji bo naskirina mafê penaberiya siyasî ya Rêber Abdullah Ocalan erê kirin. Lê belê li ser navê Wezîra Karên Derve ya DYA ya wê demê Madeleîne Albîrght berdevkê wê James Rûbîn daxuyaniyek da; nerazîbûn nîşanî vê da û diyar kir ku ew ê naskirina mafê penaberiyê ji aliyê ti welatî ve qebûl nekin. Serokwezîrê Rûsyayê Yevgenî Prîmakov destûr neda Rêber Abdullah Ocalan li Rûsyayê bimîne û jê xwestin, Rûsyayê biterikîne.

**Kurdên li Ewropayê herkîn qadan**

Rêber Abdullah Ocalan, li ser vê komploya ku Rûsya jî tevlî bû, berê xwe da Îtalyayê û di 12’ê Mijdara 1998’an bi balafirê derbasî Îtalyayê bû. Tevî ku Îtalyayê soz dabû jî, piştî ku Rêber Abdullah Ocalan hat nava xaka Îtalyayê, der heqê wî de biryara girtinê hat dayîn. Kurdên li Ewropayê jî herikîn Îtalyayê û xwedî li Rêber Abdullah Ocalan derketin. Kurdan li nêzî mala Rêber Abdullah Ocalan lê dima çalakiya rûniştinê pêk anîn. Mayîna Ocalan li Romayê êdî nepêkan bû. Piştî 66 rojan, di 16’ê Çileya 1999’an de ew ji Romayê derket û careke din berê xwe da Rûsyayê.

Ji kêliya ku Rêber Abdullah Ocalan hat û pê ve Rûsyayê dabû xuyakirin, ku ew ê wî qebûl neke. Biryar hatibû dayîn ku di ser Ermenîstan Karabagê re li Kurdistanê vegere. Lê belê dema li balafirê siwar bû, rêya balafirê bi awayekî derveyî kontrolê hat guhertin û ew li Duşanbe hat danîn. Di 26’ê Çileyê de jê xwestin ku wir jî biterikîne. Bi tenê rêyek li pêşiya Rêber Abdullah Ocalan mabû, ji nû ve li Yewnanîstanê vegere, bi balafireke ku hate kirêkirin ew li Balafirgeha Navneteweyî ya Atînayê peya bû. Lê destûr jê re nehat dayîn ji bo li Yewnanîstanê bimîne. Rêber Abdullah Ocalan vê carê çûyîna Hollanda weke pêşniyar pêşkêşî rayedaran kir, ji bo derkeve pêşberî dadgeha navneteweyî Hollanda hilbijartibû. Li gorî hatibû gotin wê balafirekê Rêber Abdullah Ocalan ji Atînayê bibira bajarê Rûsya Spî Mînsk û ji wir jî bi balafireke din biça Laheyê. Lê dema ew li Balafirgeha Mînskê peya bû, balafira wê pê biça Laheyê li holê nebû. Ji ber vê yekê ew neçar ma vegere Yewnanîstanê û ji ber zextê terikandina welêt lê hat kirin, vê carê bi heman balafirê ji Girava Korfû re hat şandin. Piştî wê berê Rêber Abdullah Ocalan dan welatên Afrîkayê.



**Çûyîna Afrîqiyayê**

Di 2’ê Sibata de berê balafira Rêber Abdullah Ocalan dan Kenyayê. Rêber Abdullah Ocalan li Kenyayê li hemberî zextan li ber xwe dida. Tevî zextên Amerîkiyan û Yewnanîstanê jî Sefaretxaneya Bilind a Yewnan neterikand. Kenyayê di 15’ê Sibatê de xwest Rêber Abdullah Ocalan bê dersînorkirin. Bi şertê çûyîna Hollandayê terikandina avahiyê qebûl kir. Lê belê wesayîta ku ew dibir balafirgehê ji nişka ve ji nava konvoyê derket û winda bû.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê di 15’ê Sibata 1999’an de hat revandin û li Girtîgeha Yek Kesî ya Ewlekariya Bilind a Îmraliyê hat bicihkirin .Piştî ku ew li Girtîgeha Îmraliyê hat bicihirin, girav bi temamî weke herêma ewlekariya taybet hat îlanirin û tedbîrên awarte yên leşkerî hatin wergirtin.

**Armanca Komplogeran**

Rêber Abdullah Ocalan derbarê armanca Komploya Navneteweyî de wiha dibêje: “Hêzên komploger PKK li hemberî Projeya Mezin a Rojhilata Navîn weke astengî didîtin. Lewma li hember PKK’ê û Rêberê wê êrîş dan destpêkirin.” Herwiha derbarê DYA wiha dibêje: “: Amerîka bi radestkirina min re feydeya ji Tirkiyeyê û çalakiyên li Rojhilata Navîn û Balkanan gihand lûtkeyê. Heman xisûs ji bo Îngîltereyê jî wiha ye. Îsraîl jî bi rola xwe ya di vê bûyerê de peywendiyên xwe yên stratejîk ên bi Tirkiyeyê re ispatkir.”

**Rûyê rast yê NATO’yê**

Rêber Ocalan wiha qala wan rojan dike: “Min rûyê rastî û veşartî yê NATO’yê di dema van seferan de dît. Di dema vegera ji Mînskê de ferman û alarma bîstûçar saetan dabûn ku balafir li ti balafirgeha welatekî Ewrûpayê danekeve. Em fêhm dikin ku di wê demê de ji bilî balafirgeha Mînskê ya dewleta bi tenê ya îsyankar Rûsya Spî balafirgeha welatekî din a destûrê bide daketina me nehiştibûn. Li cehennema Naîrobiyê sê rê li pêşiya min danîbûn: Ya yekê, bi sedema ku min demeke dirêj guh nedaye fermanê bi awayekî şiklî ez ê bihatama kuştin; ya diduyê, min ê yeka CIA’yê nekirana didu biketama bin fermana wê û teslîm bibûma; ya sisiyan, wê min radestî tîmên şerê taybet ên Tirk bikirina ku ev ji zû ve amade kiribûn.”

Têkildarî tevlîkirina Yewnanistanê ya komployê jî Rêber Abdullah Ocalan wiha dibêjediyar: “Yewnanistanê beriya her tiştî fermana Emerîkayê anî cih”.

**Pêvajoya Komployê**

Rêber Ocalan pêvajoya komployê wiha dinirxîne: “Pêvajoya ji çar mehan a ji 9’ê Cotmeha 1998’an heta 15’ê Sibata 1999’an bi rengekî bêhempa derbas bûbû. Ji bilî hegemona cîhanê DYE, ti hêzê nikarîbû ev operasyona ji çar mehan di vê pêvajoyê de bikira. Rola hêzên şerê taybet ên Tirk (Serokê vê hêzê jî General Engîn Alan bû) di vê pêvajoyê de ew bû ku tenê min bi balafirê bigihîne Îmraliyê, ew jî veguhastineke bi kontrol bû. Ev pêvajo pêvajoyeek welê bû ku operasyona herî girîng a dîroka NATO’yê hate kirin. Ev yek ewqasî eşkere bû ku li her cihê diçû, kesî helweseteke dijber nîşan nedida. Yên ku nîşan didan jî yekser dihatin bêbandorkirin. Rûsya Mezin jî bi rengekî eşkere hatibû bêbandorkirin. Helwesta Yewnanan ji xwe têra vegotina her titşî dikir.”

# KOMPLOYA MEZIN A GLADÎOYÊ... Derketina Ji Sûriyê...(1)

**Abdullah Ocalan**

Derketina ji Sûrî bi operasyona NATO-Gladîo'yê re têkildar e. Eger em jihevcudabûna di nava artêşa Tirk de û Gladîo'yê li ber çavan negirin, em nikarin vê operasyonê rast şîrove bikin. Bi qasî tê yeqînkirin, Serokatiya Fermandariya Giştî ya I. Hakki Karadayi û ya Huseyin Kivrikoglu serdestî her tiştî nebûn. Di pirsgirêka Kurd de nêzî helwesta Eşref Bitlis bûn. Li gorî wan bi şer bi temamî tesfiyekirina Kurdan hem ne pêkan bû, hem jî ne rast bû. Çareseriya siyasî û aştiyane ya Turgut Ozal û Eşref Bitlis dixwestin bidin destpêkirin hem weke erkeke welatparêziyê, hem jî li gorî têgihiştina şerê klasîk di cih de didîtin. Sakip Sabanci jî di nava TUSIAD'ê de temsîla beşekî dikir ku xwedî li vê xetê derdiket. Di nava MIT'ê de Serokê Daîreya Kontrgerîlla Mehmet Eymur û ji nava Midûriyeta Polêsan jî Hanefî Avci nêzîkatiyên wan parelelî heman xetê bûn. Vê ekîbê bûyera Sûsûrlûkê jî nirxandibû û li dijî lobiya şer pêngavek avêtibû. Dogan Gureş û Çevîk Bîr temsîla ekîba dijber an jî baskê Gladîo'yê dikirin. Hewldanên reşkujiyê yên li beramberî Sakip Sabanci û Huseyin Kivrikoglu ji aliyê vê ekîbê ve hatibûn pîlankirin. Wekî din, berê jî di serî de li dijî Turgut Ozal û Eşref Bitlis gelek reşkujiyên bi armanca tesfiyekirina hin kesan di nava dewletê de ji aliyê selefên heman ekîbê, û dûvikên wan ên berê ve hatibûn pêkanîn. Sala 1990'î li gorî rêûresmên artêşê dora Serokatiya Giştî ya Fermandariyê hatibû Muhittin Fisunoglu. Kengî li derveyî rêzik û pîvanan Dogan Gureş bû Serokê Fermandariya Giştî derz û nakokiya di navbera wan de mezin bû. Ekîba din, bi çaya jehr xistibû navê hewl da bi destê du eskerên sempatîzanê PKK'ê yên di nava artêşê de Dogan Gureş bikujin. Ev hewldana reşkujiyê tam bi ser neket. Li Îmraliyê kengî dozgerê eskerî yê taybet pirsî kê der barê vê mijarê de biryar daye, min got herdu esker sempatîzanê PKK'ê bûn, piştî bûyerê reviyan û tevlî nava refên gerîlla bûn û herdu jî şehîd bûne. Min gotibû ez texmîn dikim ku biryar ji nava artêşê hatiye dayîn. Bi vî awayî, jêpirsîna di vî warî de jî bi dawî bû.

Di nava artêşê de nakokiyên bi vî rengî heta bi serê sedsala 20. û heta hê beriya wê hene. Ji xistina text a Siltan Ebdulhemîd heta bi hewldana reşkujiyê ya Mistefa Kemal, ji pêvajoya qirkirinê ya li dijî Kurdan a bi komploya 15'ê Sibata 1925'an a li dijî Şêx Seîd dest pê kir û heta bi 18'ê Mijdara 1937'an bi komployê darvekirina Seyîd Riza, ji girtina Firqeya Serbest (1930) heta bi xistina Înonî ya ji serokwezaretiyê (1937), ji darbeya eskerî ya 27'ê Gulana 1960'î heta bi




darbeya postmodern a 28'ê Sibata 1998'an û herî dawî jî piştî salên 2000'î amadekariyên darbeyê bi qasî sedsalekê derbas bûye û di tevahiya van bûyerên bi vî rengî de şerê heman xetê heye. Pêşî Elmanya, paşê li gorî rêzê hêzên hegemonîk Ingilîstan û DYE'yê ji derve destek didan van şeran û bi vî awayî ew kontrol dikirin. Ev bûyerên reşkujî û komployê hemû bi xwe şerên hegemonyayê yên li dijî gelên Rojhilata Navîn, nexasim li dijî gelên Anatolya û Mezopotamyayê îfade dikin. Ji van şeran a para berxwedana Kurd a PKK pêşengiya wê dike çar demên girîng ên şerê Gladîo'yê ne ku min di beşên beriya vê de bi awayekî pêşnûme pêşkêş kiribûn. Şerê hêzên hegemonîk ên kapîtalîst bi kirasê faşîzma Tirkê Spî dewam dikir. Ji dema M. Kemal ve beşekî di nava artêşê de yê ji vê zivêr hebû. Ev beş welatparêz û Anatolîparêz bû. Ji darbeya 27'ê Gulana 1960'î heta bi amadekariyên darbeya piştî salên 2000'î rewşa vî beşî ji komploger û darbekaran cuda bû. Li pişta darbekar û komplogeran bi awayekî bingehîn NATO û Gladîo'ya wê hebûn. Herweha di nava civaka sivîl de navend û şaxên xurt ên herdu aliyan hebûn. Ev di nava xwe de timî xwedî nakokî û têkilî ne. Li gorî deman serdestiya wan a li ser hevdu diguhere. Ji aliyê çînî ve jî divê bûrjûwaya mîllî û hevkar temsîl bikin.

Ha di navbera van herdu beşan de berî ku ez ji Sûrî derkevim dîsa hevrikî û reqabetê serî dabû. Reqabeta di navbera beşê alîgirê diyaloga bi me re û dijberê wan de, bi desteka Îsraîl û DYE'yê baskê NATO-Gladîo ango beşê alîgirên şer û îmhayê serdest bûbûn. Beriya derketinê bi demeke kin, îstîxbarata Îsraîlê bi awayekî neyekser bi israr peyam dida ku divê ez ji Sûrî derkevim. Min veqetîn di cih de nedîtibû. Min fikar dikir ku wê statuya me ya li Sûrî derbeke mezin bixwe. Min ji aliyê stratejîk û îdeolojîk ve rast nedidît. Şer wê di riya xwe ya xwezayî de bimeşiya, di çarenûsê de çi hebû wê ew biqewimiya. Ez ne li ser xeta çarenûsî bûm. Lê ji bo min helwesteke manedar a dijçarenûsê nebû ku ez rabûma min xeta eskerî, polîtîk û îdeolojîk a sîh salî bidaya aliyekî û rota biguherta. Diviyabû ez durist bûma, ne rast bû ku ez li rizgarkirina xwe bifikiriyama. Piştî ku Atîlla Ateş li ser navê NATO-Gladîo cara dawî hişyar kir, eger Sûrî û Rûsya bi awayekî bi biryar pişta me bigirta şensê me hebû ku me şer derxista asteke jortir û bêhtir berfireh bikira. Lê bihêlin em vê destekê bibînin, herdu welat hêza wan tinebû giraniya min a şexsî rakin an jî ji bo vê niyeta wan tinebû. Bi rastî ji bo Sûrî ev ne pêkan bû. Ji Bakur Tirkan, ji Başûr jî Îsraîliyan di nava rojekê de karîbûn wê dagir bikin. Eger neketibûna nava panîkê, karîbûn ji bo min cihekî bêhtir di cih de bibînin. Nikarîbûn vê jî li ber çavan bigirin. Jixwe helwesta Rûsyayê bêhtir bêrûmet bû. Di berdêla Projeya Herikîna Şîn û krediya deh mîlyar dolar a IMF'ê de em bi darê zorê ji Moskovayê derxistin.

Berî ku ez behsa serhatiya xwe ya Atîna û Romayê bikim, divê em bêhtir ji nêz ve li dema beriya derketinê û dema derketinê binêrin. Ev gelekî girîng e, û mirov dikare ji vê pêvajoyê gelekî hîn bibe.

Eger mirov rast li dualîteya darbeya 28'ê Sibatê serwext nebe nikare fêhm bike ku çi diqewime. Milekî darbekaran bi pêşniyareke rastî ya aştiyê nêzî me bûbû. Ez yeqîn dikim ku der barê vê de wê di arşîva me de belge hebin. Min bawer kiribû ku nêzîkatiyên wan jî weke yên Turgut Ozal û Necmettin Erbakan ciddî ne, û aştiyê dixwazin. Ev helwesta alîgirê çareseriya siyasî û aştiyane rê li ber darbeya di nava darbeyê de vekiribû. Niha têra xwe eşkere bûye ku di wê demê de ango heta bi girtina min, Îsraîl û DYE ji sedî sed alîgirê çareseriyeke siyasî û aştiyane nebûne. Di asteke nizim de be jî dewamkirina şer û bêçareserîhiştina pirsgirêka Kurd bi israr xwestine. Ji bo Rojhilata Navîn, nexasim ji bo Iraqê kontrol bikin û wê bişikînin, bi dijwarî pêdiviya wan bi vê hebû. Ji ber ku bi tenê bi vê riyê karîbûn Tirkiyê pasîfîze bikin û pîlanên xwe pêk bînin. Turgut Ozal, Necmettin Erbakan û Bulent Ecevît bi sedema ku guh nedan van pîlanan û bêhtir bûn xwedî helwesteke Anatolîparêz, mîllîgir û di pirsgirêka Kurd de bûn alîgirê çareseriyeke siyasî û aştiyane ji desthilatdariyê hatin xistin. Ji bo alîgirên şer pirr girîng nîne ku wexta kesên behskirî ji desthilatdariyê dixin ew kes bêne kuştin an neyên kuştin. Jixwe di nava şer de ne. Bi şer dixwestin heta dawiyê biçin û her astengiya derkeve pêşiya xwe bişikînin û bi vî awayî bigihîjin armanca xwe. Di nava van astengiyan de pirsgirêka Kurd jî hebû. Ya lê difikirîn bi riya eskerî bi tevahî tesfiyekirina wê bû ango bi awayekî li qirkirina Kurdan difikirîn. Eger hêzên hegemonîk pişta vê têgihiştina ku dewama xeta Îttîhad û Teraqîgirên berê bûn negirta, ti carî şensê wan ê serketinê tinebû. Ji ber ku wan jî bi vê zanîbûn, ji sedî sed hewcedarî desteka DYE, Ingilîstan û Îsraîlê bûn. Bi derketina min a ji Sûrî di sala 1998'an de desteka pêdiviya wan pê hebû tedarik kiribûn.

Di serê salên 1990'î de desteka DYE û Ingilîstanê, di sala 1996'an de jî desteka mutleq a Îsraîlê (Di navbera Îsraîl û Tirkiyê de, di warê eskerî de peymanên hevkariyê yên stratejîk) tedarik kiribûn. Piştî ku alîkariya hewcedariya wan pê hebû tedarik kirin, dor hatibû destwerdana hundir ango di nava hukûmetê de guhertinên dixwestin wê bikirana û di nava artêşê de yên ji wan nexweşbûn wê tesfiye bikirana. Ji serê salên 1990'î ve wê ev jî gav bi gav bi cih bianiyana. Dogan Gureş ê wezîfeya Serokatiya Fermandariya Giştî dewr wergirt pêşî çûn serdana Ingilîstanê û di dema vegera xwe ya ji vî welatî de got "Ji bo tesfiyekirina PKK'ê ji me re lampeya kesk vêxistin" ev gotina wî rastiya em behsa wê dikin, îfade dike. Çawa ku em dizanin di pêvajoya pêş de bi tenê bi êrişên îmhakirina Kurdan û PKK'ê qîma xwe nayînin, Serokkomar dikujin, di nava hukûmetê de guhertinan dikin, di nava artêşê de tesfiyeyê dimeşînin, li dijî civakê tevgerên pasîfîkasyonê bi rêxistin dikin, rêzeke reşkujiyên rewşenbîr û karsazan pêk tînin û heta bi pîlankirina tevkujiyên girseyî û teslîmgirtina medyayê gelek bûyerên xeternak û şer xistin rojevê. Li vir a kêm ew e, divê mirov van hemûyan weke bûyerên zincîrwarî yên bi hev ve girêdayî fêhm bike. Ji roja Tirkiye ket NATO'yê heta bi 1998'an di bingehê tevahiya bûyerên siyasî û civakî yên li Tirkiyê de mirov heta xeta stûr a NATO-Gladîo'yê nebîne, nikare ti bûyera girîng, şer û reşkujiyê ji hev derxe. Ya rastî, li dijî daxwazên gelan ên ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê şerekî NATO'yê dest pê kiriye û weke xeleka dawî derxistina min a ji Sûrî di sala 1998'an de li vî şerî hatiye zêdekirin.



## Êdî mijar nema şerê DAIŞ'ê tenê ye!

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk a dagirker di 16'ê Çileyê de bi balafirên şer û ên bê mirov li seranserî xeta sînorê di navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê de binesaziya herêmê bombebaran û topbaran kir. Di encamê de gelek sazî û dezgehên xizmetguzariyê yên bi jiyanaê ve eleqedar ruxandin û bi temamî ji xizmetê hatin derxistin. Di êrişên beriya wê de jî gelek navendên xizmetguzariyê hatin hedefgirtin, di encamê de ziyaneke mezin li binesaziya herêmê hat û nêzî deh welatiyên herêmê yên sivîl şehîd bûn.

Piştî êrişan bi çend rojan tam di 24'ê çileyê de toreya 21'an a civîna Astana ku di navbera Rûsiya, Tirkiyê, Îran û hikûmeta Şamê de ye, hate lidarxistin. Tevî êrişên dewleta Tirk sûcekî şer e, lê balkêş bû aliyan di civînê de bi tu awayî behsa êrişên dewleta Tirk li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê nekirin. Dibe bi awayekî veşartî behsê hatibe kirin, lê di encamnameya wan de tiştek nîn bû.

Ev bi xwe hevkarî û erêkirina hemû aliyên Astana û dijberiya wan bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re nîşan dide. Di civînên wan ên berê de jî di tu xalan de lihevkirinek tişta wan dighîne hev dijitiya Rêveberiya Xweser e. Em êrişên niha li Dêrazorê ku komên girêdayî hikûmeta Şamê û Îranê li dijî bargehên QSD'ê tînin ji plana Astana cuda negirin dest.

Êrişên dewleta Tirk û êrişên çekdarên êgirdayî Şamê û Îranê di çarçoveya yek planê ku navenda Astan ye. Lê zêde bike, dorpêça li ser Şehba û taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê. Ew bi hemû hêza xwe ji bo tunekirina Rêveberiya Xweser di nav tevgerê de ne.

Di nava vê rewşê de hêzên Koalîsyona Navdewletî û di serî de Amerîka ku îda dike ew serkêşiya şerên li dijî DAIŞ'ê dike û ji bo wê li herêmê ye, naxwaze guhertinên mezin di herêmê de çêdibin, bibîne. Rewşa di herêmê de hîn zêdetir metirsîdar bûye. Derfet û zemîna derketina DAIŞ'ê careke din çêbûye û daxuyaniyên QSD'ê di vê derbarê de çêbûne.

Ji xwe piştî şerê Hemas û Israîlê em dinêrin bargehên Amerîka li Sûriyê û Iraqê têne bombebaran kirin. Kuştina 3 leşkerên wan li Urdinê û bombebaran û topbarana li dijî baregihên wan li Sûriyê û Iraqê aliyekî wê yê din e. Duh jî 6 şervanên QSD'ê li zeviyên Omer a Dêrezorê di êrişeke hevkarên Îranê de şehîd bûn. Destpêkê hat gotin ku êriş li dijî bargeha Amerîka ya li zeviyên Omer bû. Paşê diyar bû ku êriş li dijî Akademiyeke QSD'ê bû. Ji xwe navenda ragihandinê ya QSD'ê derbarê êrişê de daxuyanî da û tekez kir ku çekdaêrn girêdayî Îranê ji xaka Sûriyê êriş li dijî Akademiya wan pêk aniye.

QSD'ê û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne ji Amerîka û parastina wê li Zeviyên Omer in, lê belê şervanê wê parastina xaka xwe dikin. Beriya hatina Amerîka jî şervanên vê herêmê parastina xwe dikin û li dijî gelek aliyan şer dikirin.

Lê li beranberî guhertinên mezin ku di herêmê de pêk tên, divê Amerîka û hêzên Koalsîyonê helwesta xwe ji aliyên Astana ku dewleta Tirk beşekî wê yê serke ye, nîşan bide. Êdî mijar ne tenê şerê DAIŞ'ê ye.



# 'Dagirkeriya Tirk zagonên navneteweyî binpê dike'

Xufran Xelef destnîşan kir ku dagirkeriya Tirk bi êrişên xwe yên hovane yên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hedefgirtina mirov û binesaziyê, zagon û pîvanên navnetewî binpê dike. Herwiha Xufran da zanîn ku ew ê tevahiya binpêkirinên dagirkeriya Tirk belge bikin û li ser wê bingehê dewleta Tirk di dadgehên navneweteweyî de darizînin.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Di dawiya sala 2023'an de êrişên dagirkeriya Tirk li ser herêmê di bi awayekî dijwar hatin destpêkirin. Di encama êrişan de gelek welatî û binesaziya herêmê û cihên xizmetguzarî hatin hedefgirtin. Êrişên dewleta Tirk a dagirker bênavber êrîşên xwe li ser herêmê dan domandin û bi destpêkirian sala 2024'an re jî êrişên xwe hîn dijwartir kir.

Ji destpêka sala 2024'an heta roja îro dewleta Tirk a dagirker carekê 74 caran êrişî deverên cuda kir û careke din 80 deverên din hatin armancgirtin, ji wan binesazî, saziyên xizmetguzariyê û saziyên aborî. Di encamê de 7 welatî birîndar bûn, sitasiyonên bitrol, eletrîk û gazê hatin ruxandin. Di hema demê de stasyona berhemdayîna elektirîkê ya tekane ya herêmê hat rûxandin. Girêdayî êrişên dagirkeriya Tirk yên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê parêzer Xufran Xelef ji rojnameya me re axivî.



### Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşeke nimûneyî û rasteqînî ye

Xufran Xelef da zanîn ku şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser asta cîhanê, herwiha li dijî hêzên desthilatdar şoreşeke nimûneyî ye û wiha got: "Di destpêkê de em berî hertiştî hertim tekez dikin ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser asta cîhanê tevî mînaka şoreşê ya rastînq e. Sedem ji vê yekê jî ji ber ku bingehê ku şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser hatiye avakirin, felsefeya netewa demokartîk û bîrweriya gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Ev şoreş timî weke kelmekê li himberî hişmendiya erdoxaniyetê, dewleta Tirk a dagirker û şêweyên desthilatdariyê. Lewma em dibînin ku dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên li ser herêma me zêde dike. Bi dirêjahiya 12 salan û bi destpêka şoreşa 19'ê Tîrmehê re dagirkeriya Tirk bi hemû rêbazên xwe li dijî vê şoreşê rabû û hîna jî berewame. Dewleta Tirk a qirker ji bo ku şoreşa 19'ê Tîrmehê têk bibe û vîna gelan bişkîne pilanên qirêj bikar anîn. Di vê deman dawî de jî em dibînin ku dagirkeriya Tirk bi awayekî dijwar êrişî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Lê ji ber hişyarbûna gelên herêmê ji girîngiya vê qonaxê û piştgiriya wan ji Rêveberiya Xweser re, vîna gelan hemû êrîş vala derxistin. "

### 'Êrişên dagirkeriya Tirk madeya 5'an a Dageha Tewnan binpê dike'

Xufran diyar kir ku dagirkeriya Tirk bi êrişên xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, zagonên navnetewî binpê dike û wiha domand: "Li gorî xala 5'an a Dadgeha Tawanan a Navnetewî êrişên dewleta Tirk a dagirker yên ku çendîn car li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tên, sûcên şer li dijî mirovahiyê ne. Herwiha dagirkeriya Tirk bi van êrişên xwe yên hovane sûcê şer dike û li di derheqê mirovan de komkujiyan pêk tîne. Hêjaye ku em bibîr bixin ku hedefgirtina binesaziyê û welatiyan, binpêkirina peymanên Cinêv e. 3 peymanên Cinêvê ku hatin lidarxistin, ewlekariya gel û binesaziyê di rewşên şer de diparêze û çênabe ku werin hedefgirin. Em weke parêzer xebatekê ji bo derxistina binpêkirinên derzagonî yên ku dewleta Tirk a dagirker li herêma me dike bi belge dikin. Herwiha da ku li saziyên navnetewî yên eleqedar bi parastina mafên mirovan li dijî dewleta Tirk a dagirker doz bê vekirin xebateke cidî tê meşandin. Li gorî xala 5'an a Dadgeha Tewanan a Navnetewî, her dewletek dikare dozê li dijî dewletek din veke dema ku komkujî û binpêkirin di derheqê mirovan de pêk were. "

### 'Ji bo doza dadgehkirina dagirkeriya Tirk xebat berdewam e'

Parêzer Xufran Xelef destnîşan kir ku xebata ji bo rakirina doza dadgehkirina dagirkeriya Tirk li ser asta navnetewî berdewam e û wiha axivî: "Mixabin hemû civaka navdewletî li hember van binpêkirinan bêdeng dimîne, ji bilî hin daxuyaniyên şermok yên ku ji hêla hin rêxistinan tê dayîn, ti helwest ji aliyê civaka navdewletî tune ne. Niha kar ji bo belgekirina binpêkirinan û destnîşankirina van tawanan di bin rêgezên qanûnî yên pêwîst de tê kirin. Di heman demê de em weke parêzerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê çalakiyan girêdayî aliyê zagonî ji bo êrişên dagirkeriya Tirk li ser herêma me, li dar dixin. Weke kongira mafnasiyê ya ku di 18'ê meha Çile de ji aliyê Yekîtiya Parêzeran, Meclisa Dadweriyê û Rêxistina Mafê Mirovan ve li bajarê Qamişlo hat lidarxistin. Em bang li civaka navdewletî û hemû rêxistinên eleqedar dikin ku bi cidî li ser van binpêkirinan bisekinin. Em ji aliyê xwe ve jî weke parêzeran çi di warê daxuyanî û çalakiyan an belgekirina binpêkirinan û hewldana li darxistina dadgehan ji bo parastina mafê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de be jî dê hertim xebata me berdewam be. "

## Li Kurdan xistin serbest e!



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê bê ku were sînordarkirin bi dilê xwe hêza leşkerî bikar tîne. Bi havîn û zivistan, şev û roj çiyayên Kurdistanê, sîberên gerîlayan bi balefir, helîkopter û topan tê bombebarankirin. Bi dehan baregehên leşkerî hatine avakirin. Hêjmarên baregehan zêde dikin û herêmên dagirkirinê berfireh dikin. PDK'ê ya li herêmê bi bandor e van êrişan destek dike û rewa dike. Hikumeta navendî ya Iraqê jî dibêje ew der herêma Kurdan e çi bi serê wan tê bila were. Hikumeta Iraqê dibêje, her çawa be Kurd, yanî xwediyên malê bi dagirkeran re hevkar in, çima ez serê xwe biêşînim.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rewş hîn cudatir e. Ev herêm hîn zêdetir bi koalîsyonê re hevkarî çêkirin û DAIŞ'ê tune kirin. Hêzên koalîsyonê li herêmê bûn. Ji deh hezaran zêdetir girtiyên DAIŞ'ê hebûn. Pêwîst bû ev di girtîgehan de bên girtin û werin parastin. Heman demê de bi hezaran malbatên DAIŞ'ê di kampên weke Kampa Holê de bûn. DAIŞ bi tevahî nehatibû tunekirin û xwe vekişandibû binê erdê. DAIŞ ji bo ewlehiya cîhanê xeteriyek bû. Ji bo vê jî Îran, Rûsya, DYE, Ewropa û welatên Ereb li hemberî DAIŞ'ê xwedî helwest bûn.

Tirkiye jî berovajî cîhanê bi DAIŞ'ê re di nava hevkariyê de bû. Taybet jî ji ber dijminahiya li hemberî gelê Kurd rêveberiya Erdogan DAIŞ destek kir û berê wan da Kurdan. Xwest Kurdan bi destê DAIŞ'ê xilas bike. Nûnerê taybet ê DYE yê wê demê Brett McGurk herî baş vê pêvajoyê dizane. Her çi kir rêveberên Tirk sînorên xwe ji DAIŞ'ê re negirtin. Bi dehhezaran DAIŞ'î ji welatên cuda yên cîhanê di ser Tirkiyê re herikîn Sûriye û Iraqê. Erdogan mizgîniya êrişên DAIŞ'ê dida: Digot, "Kobanê li ber ketinê ye". Lê nebû, Kobanê neket. Yê ku ket û binket DAIŞ bû. Piştî ku sînor ji DAIŞ'ê hatin paqijkirin û Kurd bi bandor bûn, aliyê Tirkan kire qîre qîr û got "sînorên me di xeteriyê de ne" û hema dest bi lêkirina dîwaran kirin.

Tirkiyê tucar li dijî DAIŞ'ê şer nekir. Ew kir hêncet û ket Sûriyê û herêmên weke Cerablus û Babê dagir kir. Armanca wan astegkirina gihiştina xeta Kobanê û Efrînê bû. Jixwe niha vê bi awayekî vekirî tîne ziman. Dibêjin, em weke xencerekî ketin korîdora Kurdan, me yekbûna wan asteng kir. Li gel dagirkeriyê jî Kurd û Ereb bûne yek û Rêveberiya Xweser ava kirin û xwe parastin. Bi vê re faşîzma Tirk bi Rûsan re bû yek û Efrîn dagir kir. Wê jî têra faşîzma Tirkan nekir. Vê carê jî bi Tramp re li hev kirin, Girê Spî û Serêkaniyê dagir kirin. Herêmên hatin dagirkirin ji Kurdan hatin valakirin, piraniya axê dane malbatên çeteyên Ereb û şêniyên berhevkirî lê bicih kirin. Rêveberiya Biden wê demê Trump rexne dikir. Ji DYE yê rexne li Trump kirin û digotin te Kurd firotin. Ji ber Kurdan ji şerê li dijî DAIŞ'ê re pêşengî kirin û ji 10 hezaran zêdetir şehîd dan. Trump herêmek girîng pêşkêşî Tirkan kir. Lê vê jî pergala qirker a Tirk têr nekir. Ji bo wan hebûna Kurdan, hele hele statû bidestxistin dawiya dinê bû. Teqez divê bihata perçiqandin û tunekirin.

Dewleta Tirk di dawiya kanûnê û heta nîva çileyê de êrişên giran ên hewayî birin ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Taybet jî herêma Cizîrê ya piraniya şêniya wê Kurd e kir armanc. Cihê hatin lêxistin cihên elektirîk, gaz û petrolê bûn ku jiyana gel li ser lingan digirt. Ne cihên leşkerî bûn. Ji ber dewleta Tirk dixwaze herêmê bîne rewşa ku jiyan lê nebîne û Kurdan bide koçberkirin. DYE û Rûsyayê qada hewayî ya Sûriyê di navbera xwe de parve kirine. Eger erêkirina van herdû dewletan nebe dewleta Tirk nikare êrişî herêmê bike. Ew çi bêjin jî derew e. Tu mafê dewleta Tirk li ser Sûriyê tune ye. Cihên ku êrişî dike di nava sînorên Sûriyê de ne. Eger qada hewayî venekin balefirên Tirk nikarin bikevin hindir. Balkêş e, Trump du herêm ji dagirkeriya Tirkiyê re vekir. Paşê şandeyek şand Enqereyê û xwest şer bisekinîne. Zextên li ser pir bûn. Heman demê de dema rêveberiya Tirk planên dagirkeriyê çêkirin û gef xwarin, Trump gefa dorpêçê li wan xwar. Biden ê ku Trump rexne dikir, peyva dorpêçê nekir devê xwe, heman demê de dorpêça berê ya Ewropa û Kanadayê li ser Tirkiyê rakir. Di beramberî endamtiya Îsveçê de Kurd pêşkêş kirin. Eger li hemberî êrîşan evqas bêdeng in sedem bazar û lihevkirinên wan in. Rêveberiya Trump du herêm ji dagirkeriyê re vekir, lê xuyaye rêveberiya Biden tevahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji dagirkeriyê re vekiriye. Ji ber dewleta Tirk ji Şehbayê heta Dêrikê bombebaran dike. Rêveberiyên xweser nikarin bixebitin. Asayîş jî di nav de herkesî li her derê dixe. Eger ewlehiya bajar û rêyan neyê girtin, dê herêm ji hêzên weke DAIŞ'ê re vebe.

Dema rêveberiya DYE yê tê rexnekirin dibêjin "me soza parastina rêveberiya xweser li hemberî Tirkiyê neda" û xwe diparêzin. Dema balefir û êrişên rêveberiya xweser hatin ber nexebitînê, hûna çawa girtiyên DAIŞ'ê di girtîgehan de bigirin? Dema QSD di bin êrişan de be û li her derê were kuştin, dê çawa weke ku tiştek nebûye we di baregehên we de biparêz e û bi we re beşdarî operasyonên li dijî DAIŞ'ê bibe? Erê DYE yê soz neda û negot ezê we li hemberî Tirkiyê biparêzim, ma got êriş û kuştina we serbest e? Qet nebe vê jî ragihînin, bila gelê we û tevahî cîhan bizane hûn çi dikin!



## Ji Meşa Romayê ber bi Meşa Kolnê

**Farûk Sakik**

Em dîsa di meha Sibatê de ne û li hemberî komployê hêrsa me danakeve. Ev 25 sal e her sal, di 15'ê Sibatê de Kurd di vê roja reş de dadikevin qadan. Dîlgirtina rêber Apo tê şermezarkirin. Bi şermezarkirinê sînorkirî nahêlin, ji bo komplo vala derkeve û Rêber Apo jî azad bibe, têdikoşin.

Îsal ji her salî cuda ye. Her sal li benda 15'ê Sibatê diman û ewroj li Starasbûrgê kom dibûn, êvarê jî vedigeriyan mala xwe derbasî jiyana normal dibûn.

Lê îsal, ji salek berê de amadekariya vê mehê hatiye kirin. 10'ê Cotmeha 2023'yan pêngavek dan destpêkirin. Demek dirêj e ji bo meşa li Kolnê ya 17'ê Sibatê amadekarî tên kirin.

Civînek hevserokên meclîs û federasyonên kurdan yên li Ewropa hebû. Bi salane van çalakiyên wan min dişopand, lê îsal biryardariyek min di çavên wan de dît.

Min di çavên wan de, biryardariya sala 1998'an de dema Rêber Apo li Roma bû dît.

Di sala 1998'an de dema ku Rêber Apo derbasî Roma bû, Kurdên li Ewropayê wek rûbarek herikîn Romayê.

Di rojên zivistanê, sar û seqemê de, bi rojan li qada Cello rûniştin.

Ev çalakiya wan, ev meşa wan, ev bîrdoziya wan, ev xwedîderketina wan a li Rêberê xwe, ji aliyê civaka Ewrûpa bi baldarî hatibû temaşekirin.

Heger ewroj ev xwedîderketin pêknehata diviya komplo ber bi merheleyeke cuda ve bi encam bibûya.

Em wan çalakiyên xwedî wateyek pîroz nîqaş nakin. Ku di pêvajoya komployê de destpêkiribû. Çalakiyên canbaxişyane ku li dora Rêber Apo ji agir xelekek çêkiribûn. Ev çeka herî mezin bû ku komplogeran tirsandibû. Ew difikirîn kesên ku xwe bişewitîne dikare li dijmin çi bike.

Lê mixabin, ji wê rojê hetanî îroj, xemsariyek heye. Me dikarîbû hîn deha zêdetir midaxleyî pêvajoyê bikira.

Rexneya herî mezin jî em dikarin li helwesta xwe ya van 3'ê salên dawî bikin. Tecrîd û komplo normalîzekirin. Bi demê re mêjî fêrî vê rewşê kirin. Me digot em ê fêr nebin lê me xwe xapand.

Ev pêngava ku ev 3-4 meh e destpêkiriyê diviya me 3 sal berê dest pê bikira.

Lê dîsa jî em dereng neketine. Vaye şansek ku li hember Rêber Apo em xwe bidin efû kirin derketiye. 17'ê Sibata 2024'an.

Divê bi rohê ku di sala 1998'an de Kurd herikîn Romayê û evcar biherikin bajarê Kolnê.

24 sal e ev kevneşopiya çalakiyê, li Strasbûrgê, li bajarê ku navenda vê komployê ye, pêk dihat. Hemû saziyên ku bi Îmraliyê re têkildar bûn li vî bajarî bûn.

Îsal çima biryar girtin ku li Almanyayê ev meş were lidarxistin? Almanya, tercîhek ku di encama nîqaşan de hat girtin bû. Giraniya Kurdên li Ewrûpayê, milyonek û nîv li vî welatî ne.

Hin kes dibêjin bi meş û mitîngan tecrîd nayê şikandin û Rêber Apo fîzikî nayê azadkirin. Nêrînek xelet e. Van kesan di sala 1998'an de jî digotin komplogeran ji xwe biryar girtine. Lê wisa nebû.

Bi van çalakiyan ew ê dubare were îspatkirin ku Ocalan Rêberê Gelê Kurd e. Kurd ji bo azadiya wî dikarin îro jî wek sala 1998'an gelek tiştan bikin.

Dîsa di çarçoveya 10'ê Cotmehê de ji bo paradîgma û kesayeta Rêber Apo bidin naskirin gelek çalakî tên lidarxistin. Bi van çalakiyan dostên Kurdan zêde dibin. Bi tevlîbûna wan jî hêza Kurdan xurt dibe.

Heger di 17'ê Sibatê de em rihê Meşa Romayê derbasî Kolnê bikin ew ê, ev yek wê ji bo azadiya Rêber Apo bibe gava destpêkê. Gava encamgirtinê.